DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

## https://rantey.org

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

# MÎRZAYÊ BIÇÛK

## Antoine de Saint-Exupéry



Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

NÛDEM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MÎRZAYÊ BIÇÛK

## Antoine de Saint-Exupéry

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MÎRZAYÊ BIÇÛK

## Antoine de Saint-Exupéry

Wergera ji fransî: **Fawaz Husên**

Weşanên NÛDEM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Weşanên NÛDEM: 19
Mîrzayê Biçûk
Çapa yekem: Stockholm 1995

Traduit en kurde par
Fawaz HUSSAIN.

© Editions Gallimard, 1946, pour le texte original
© Editions Nûdem, 1995, pour le texte kurde
Pergala berg û rûpelan: NÛDEM
Wêneya bergê: Antoine de Saint-Exupéry
ISBN: 91-88592-19 7

Navnîşan:
Termov. 52, 2tr.
175 77 Järfälla-Sweden
Tel û Fax: 8-58356468

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ez vê wergerê diyarî Esthêr, Stêra xwe, keça xwe dikim.

Fawaz Husên

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Berhemên Antoine de SAINT-EXUPÉRY

Nameyên Başûrê (1928)
Fira bi şevê (1931)
Erda Mirovan (1939)
Balafirvanê Cengê (1942)
Mîrzayê Biçûk
(Ligel nigarên nivîskar) (1943)
Nameyek ji Girtiyekî re (1943)
Kelehdiz (Çapbûyî piştî mirina nivîskar, 1948)
Nameyên Xortaniyê ji hevaleke xeyalî re û
Defterçe (1936-1944). (Çapbûyî piştî mirina nivîskar, 1953)
Nameyine ji bo diya wî (Çapbûyî piştî mirina nivîskar, 1955)
Meneyek ji bo jiyanê (Çapbûyî piştî mirina nivîskar, 1956)

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Antoine de SAINT-EXUPÉRY (1900-1944)

Antoine de SAINT-EXUPÉRY li bajarê Lyonê di 29'ê meha şeşan de ji sala 1900'î ji diya xwe dibe. Di çarsaliya xwe de, Antoine bavê xwe winda dike û sêwî dimîne. Lê rewşa malbata Saint-Exupéry xweş e û ligel mirina vî bavî, Antoine û zarokên din bi diya xwe re biçûkaniyeke xweş dibînin.

Di sala 1909'an de diya wî li Mansê bi cih dibe û Antoine li wê derê diçe dibistanê. Ev salên xwendin û zaroktiyê ciyekî mezin di nav bîranînên wî de digirin. Antoine wê paşê binivîsîne ku li ser her masê ji masên dibistanê, wî hinek ji wê dilovaniya zaroktiya xwe hiştiye.

Di sala 1912 ew çav li balafirekê dikeve, dibîne çawa ew bi asamanan dikeve. Ji wê gavê, daxwaza firînê di hinava wî de ciyekî mezin digre û gava yê balafirvan têdigihêje ku ev zarok pir dixwaze li balafirê siwar bibe, ew daxwaza dilê wî bi gewde dike û wilo jî, ji bo cara yekemîn di duwanzdehsaliya xwe de, Antoine hîsên xweşî û azadiyê nas dike. Ev bûyera hanê şûna xwe di dilê Antoinê zarok de çêdike û firîn ji wê rojê jê re dibe mebest û armanc.

Di destpêka Cenga Cîhanî ya yekemîn de, Antoine û birayê xwe François derin bajarê Frîbourgê li Swîsê û xwendina xwe li wê derê berdidomînin. François bi nexweşiya dil dimire û Antoine gelekî li ber mirina vî lawikê panzdehsalî dikeve. Ew xwendina xwe ya navîn tev dike û tê Parîsê. Ew di beşên zaniyariyê û nemaze di matematîkê de xurt e lê belê di nivîsandina salixdanan de hinekî qels e. Ew di xwendina xwe de bi ser nakeve û sala 1919'an ew li zanîngehê dikeve beşê Hunerên Xweşik.

Di sala 1921ê de, ew leşkeriya xwe dike, dibe hostê balafiran. Ew peran ji diya xwe dixwaze û hînî ajotina balafirên medenî dibe û dîploma xwe ya

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

balafirvaniyê digre. Lê rêya firê hêna li ber wî dirêj e. Piştî çend salan, ew li bajarê Toulousê di kargeha balafiran de kar dike. Di 1927'an de xewna wî ya kevin û şîrîn bi gewde dibe. Ew bi balafirê nameyan ji Toulousê dibe Kazablankayê, li Afrîqa bakur û, ji wê derê jî, di ser Sehrayê re, ew wan digihîne bajarê Dakarê. Ew di sala 1928'an de navê ku li ser kîsên postexanê *Nameyên Başûrê* li romana xwe ya pêşîn dike. Ew di vê pirtûkê de li ser jiyan û zehmetiyên balafirvanan dinivîse. Weşanxane gelekî kêfa xwe ji vê romanê re diyar dike û ji Antoine de Saint-Exupéry dixwaze ku ew ji bo wê heft romanên din binivîse. Ev peymana pîrozwer tiştekî mezin di jiyana Antoinê balafiran de naguherîne ji ber ku ew her karê xwe, wek berê, berdewam dike. Ew bi balafira xwe rêya Europa û Argentînayê vedike. Ew romana xwe ya duduyan Fira bi şevê di sala 1931'ê de çap dike û mara xwe li jineke argentînî dibire. Nivîsên Antoine de Saint- Exupéry deng didin û *Erda Mirovan* (1939) Xelata Mezin ya Akademiya Fransî digire.

Cenga Cîhanî ya duyemîn dest pê dike û Antoine de Saint-Exupéry gelekî li ber şikestina Fransayê dikeve. Ew xwe digihîne Amerîkayê û li wê derê, *Balafirvanê Cengê* û *Nameyek ji bo girtîyekî* dinivîsîne. Ew çîroka *Mîrzayê Biçûk* li Nû Yorkê di sala 1943an de dide çap kirin û paşê berê xwe dide Cezayirê. Ew xwe digihîne hevalên xwe ên balafirvanyê. Ew anuha çel û sê salî ye û temenê herî mezin ji bo ajotina balafiran bi xwe sî û pênc e. Lê bi saya dost û nasan, ew balafirê dajo. Di 31 meha heftan de ji sala 1944 şopa wî di fira nehan de bi giştî winda dibe û kesek nizane balafira wî li kuderê dikeve.

Tiştê ku ji van pirtûkan xuya dibe ew e ku Antoine de Saint-Exupéry hemû berhemên xwe li ser jiyana balafir û balevirvaniyê, ango li ser jiyana xwe ya kesane û rojane, ava dike. Antoinê nivîskar zora Antoinê balafirvan nabe. Ew bûyeran di kirasekî edebî de rêz dike û di nav van rêzan de peyxamekê digihîne xwendevanan, moralekê, suncekê bi gewde dike. Nivîskar pesnê tevgerê, jiyana mirovan dide. Ew dibêje ku tenê tevger û berxwedan dihêlin ku meneyek ji jiyanê re çêbibe. Gava mirov xwe ji can û dil dide kar û barên xwe, ew tixûbên mirinê her gav dûr dixîne û rêya bexteweriyê fireh dike. Di xwêdan û daxwazên mirovan de meneyek ji jiyanê re


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

çêdibe. Fransa rûmeteke mezin dide Antoine de Saint-Exupéry. Ji bo bîranîna pêncîsaliya mirina wî, banka fransî wêneya niviskar û nigara Mîrzayê Biçûk li ser kaxeza pêncî frangî dixîne.

Pirtûka *Mîrzayê Biçûk* di nav berhemên Antoine de Saint-Exupéry de bi rastî ciyekî taybetî digre. Ew bi babet û naveroka xwe ji hemû pirtûkên din cihê ye. Ji navên pirtûkên din mirov dikare bizanibe ew li dora çi mijaran digerin. Eger ceng û serêşên jiyanê ciyekî mezin di nav wan de dibînin, pirtûka *Mîrzayê Biçûk* cîhaneke bi serê xwe ye, berhemeke yekta ye. Ew di nav serdemên harbûyînê de xewneke xweş e, di nav sedsalên dijminatiyê de bîstikek dilovanî ye.

Di jiyana xwe ya kurt de, Antoine de Saint-Exupéry di nav herdu cengên cîhanî de derbas dibe. Ew tenê di zaroktiya xwe de demên kêfxweşî û pakiyê dibîne. Gava ew "mezin" dibe, ew bêgav dibe bikeve nav cengê û bi "Mirovên mezin" re pêwendiyan çêbike, bijî. Di vê jiyana dorgirtî de, xewn rêya xelasê di rûyê wî de vedike, xewna xweş hergav bang wî dike. Wilo jî gava bayê hovitiyê gûr dibe û xwînxwar li bajarên Europayê li laşan digerin, Antoine di serê xwe de dûrî navendên bajarvaniyê, dûrî cengê dikeve. Ew li balafira xewnan siwar dibe, diçe Biyabanê, diçe Sehraya Afrîqayê û li wê tenhatiyê, wek piraniya pêxemberan, tiştên ku bi çavan nayên dîtin ew wan bi dilê xwe dibîne. Li wê derê ew pêrgî mîrzayekî biçûk tê û herdu, bi hev re, li rastiya tiştan digerin û aveke ne wek hemû avan vedixwin: ew li bîra dilovaniyê digerin û wê di bilindbûna hîsên pak de peyda dikin. Antoine de Saint-Exupéry dûrî Fransa şikestî, li Amerîkayê, tevnê vê xewnê kok dike. Ew bi vê berhemê, ango bi vê xewnê, salên reş li paş xwe dihêle û xwe davêje nav pêlên demên zaroktiyê. Dûrî "Mirovên mezin" ên tenê ji tiştên vala hez dikin, ew hînî jiyana rastîn dibe, xwe di kirasê mîrzayê biçûk de nas dike. Balafirvan û niviskar bi saya vê xewnê, bi alîkariya vê diltenikiyê, dikarin herdu xwe bigihînin warê hêviyê. Xewnên rojane dikarin deriyê jiyaneke sade li ber wî vekin. Antoine de Saint-Exupéry di baweriya min de dixwaze bêje ku her kes dikare li balafira xwe ya xewnan siwar bibe û pêrgî mîrzayekî biçûk bibe, her kes dikare vegere dilpakiya zaroktiyê û hîsên xêrxwaziyê.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Eger ez ne şaş bim jî, peyxama Antoine de Saint-Exupéry di vê pirtûka piçûk de ê tiştekî wilo be. Xwendevan dikarin bi gelek şêweyan vê pirtûka hanê bixwînin. Lê belê eger zarok dikarin bi gelek hêsanî têbigihêjin, ew ê ji bo "mezinan" gelekî zehmet be. Kûranî bi çavên mezinan hatiye û ta ku ew bikaribin vê pirtûkê bixwînin, gerek pêşî ew li dilpakiya zaroktiya xwe bigerin. Ew dikarin wek mîrzayê biçûk û nivîskar xwe hîn bikin çawa tiştên ku bi çavan nayên dîtin bi dilê xwe bibînin. Wilo jî ev pirtûka xweş di serdemên tîbûnê de wê bibe tasek ava hênik, di birçîbûnê de gepek nanê germ û di rojên tengezariyê de awazek xweş û dilnişîn.

Eger kêmasiyên vê wergerê hebin, -û bêguman wê hebin,- ez bexşîn û lêbihurînê ji xwendevanên biçûk û mezin dixwazim. Min ev berhem bi kelecan wergerand ji ber ku min xwest ez zû reşbeleka evîn û lêbihurînê ya di serpêhatiya mîrzayê biçûk de bigihînim xwendevanan. Ev berhem dixwaze me fêr bike çawa em bi dilpakî û dilovanî bi kesên li dora xwe bidin û bistînin. Wek ku rovî ji mîrzayê biçûk re dibêje, tiştekî bêkêmasî tune. Lê belê eger mirov hîn bibin bi dilpakî li tiştan binerin, kêmasî bêguman beyî ku rabin wê gelekî kêm bibim.

**Dr. Fawaz Husên**
Swêd, Luleå 1994.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org




Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ji LÉON WERTH re

Ez lêbuhurînê ji zarokan dixwazim ku min ev pirtûka hanê diyarî mirovekî mezin kir. Di destê min de behanek giran heye: Ev mirovê mezin di cîhanê de dostê min yê herî hêja ye. Behaneke min î din heye: Ev mirovê mezin dikare di her tiştî de û ta di pirtûkên ji bo zarokan de jî bigihêje. Behanek min ya sisyan heye: Ev mirovê mezin li Fransayê dijî û ew lê birçî ye û wî sar e. Ew bi hacet e ku mirov di ber dilê wî de bide. Eger ev hemû behanên hanê têrê nekin, ez dikarim vê pirtûkê diyarî zaroktiya wî bikim. Hemû mirovên mezin, pêşî, zaro bûn (lê belê piraniya wan vê yekê ji bîr dikin.) Ez wilo jî diyariya xwe rast dikim û dibêjim.

"Ji LÉON WERTH re gava
biçûk bû."


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org




# I

Gava ez şeş salî bûm, min carekê di pirtûkekê de li ser Daristana xwezayî bi navê "çîrokên rastîn" nigareke (resmeke) pir seyr dît. Di nigarê de marekî boa lawirek dadiqurtand. Va ye kopiyek ji wê nigarê.

Di pirtûkê de dihat gotin ku: "Marên boa nêçîrên xwe bi saxî dadiqurtînin. Paşê ew nema dikarin bilivin û di dirêjiya her şeş mehên serifandinê de radizên."

Ez wilo jî gelekî li ser serpêhatiyên cengelê ramiyam û bi qelemeke rengînî, min nigara xwe ya pêşîn çêkir. Nigara min ya hejmara yekê wilo bû:






Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Min şahkarê xwe şanî mezinan da û ji wan pirsî ka nigara min ew ditirsandin. Wan li min vegerandin: "Ma çima mirov wê ji kumekî bitirsin?"

Di nigara min de tu kum tunebûn. Ew li ser marekî boa bû ku fîlek daqurtandibû û diserifand. Ez wilo jî bêgav bûm nava marê boa çêbikim ta ku mirovên mezin têbigihêjin. Bêyî ravekirinê, ew tucarî tiştekî fêm nakin. Nigara min ya hejmara duduyan wilo bû:



Mirovên mezin pêşniyariyek li min kirin û xwestin ku ez dev ji marên vekirî an girtî berdim û bêtir guhê xwe bidim zemînnasiyê, dîrokê, hesab û rêzimanê. Wilo jî di şeşsaliya xwe de min dev ji pîşeyekê, ji hunerekî bi hêvî û ayindeyeke pir mezin berda. Ji ber bisernekeṭina nigarên min ên hejmar 1 û hejmar 2, dilê min sar bû. Mirovên mezin bi tenha xwe nikarin tu tiştî fêm bikin û bi rastî zehmet e ji bo zarokan ku ew hergav ji wan re tiştan rohnak bikin.

Ez serê we neyêşînim, ez bêgav bûm karekî din, pîşêyekî din ji xwe re bibînim û wilo jî ez bûm şufêrê balafiran. Bi balafirê min dunya li hev xist. Û rast e ku zemînnasî di gera min de gelekî bi kêrî min hat. Min dikarîbû çavê xwe bigirta û vekira û min Çîn ji Arîzonayê nas dikir. Ev yek gelekî giring e nemaze eger mirov bi şevê xwe winda bike.

Wılo jî di dirêjahiya jiyana xwe de, min qiyamek pêwendî bi qiyametek mirovên giran re danîn. Ez gelekî li bal mezinan jiyam. Min ew ji nêzîkayî nas kirin lê belê nêrînên min di


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

wan de nehatin guhertin û çêtir nebûn.

Gava di nav mezinan de ez rastî yekî dihatim û ku ew ji min re rewşenbîn xuya dibû, min nigara hejmara yekê ku min hilanîbû şanî wî dida. Min dixwest bizanîbûya ka ew bi rastî têdigihaşt an na. Wî mirovî hercar li min vedigerand: " Ev kum e." Wilo jî min behsa marên boa, daristanan û stêrikên asmanan nedikir. Min bi wî re li ser lîstikên bridgê, golfê, siyasetê û grafêtan behs dikir. Mirovê mezin wilo jî gelekî kêfxweş dibû ku ew pêrgî ademekî wilo wek min biaqil hatibû.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## II

Ez wilo bi tenha serê xwe jiyam bê ku bi rastî kesek hebûya min bi wî re deng bikira ta carekê, berî anuha bi şeş salan, li Sahrayê li Afrîqayê balafira min xera bû. Tiştek di hundirê motorê wê de şikestibû. Ji ber ku ne hoste û ne rêwî bi min re hebûn, gerek min xwe bi xwe û bi tenha serê xwe çara wê dijwariya mezin bidîta û balafira xwe dirust bikira. Rewşa min bi rastî zehmet bû ji ber ku eger min balafir çênekira, ji xwe ez ê li wê derê bimirama. Ava bi min re bi zorê têra heyşt rojan dikir.

Roja pêşîn ez li ser xîzê razam û di navbera min û avahiyan de bi hezarên mîlan hebûn. Li wê derê rewşa min kambaxtir bû ji ya mirovekî şikestî li ser çend textan di nava deryayek bê hawe mezin de. Wilo jî hûn ê bizanibin ez çiqasî mat mam gava di destê sibehê de ez bi dengekî hûrik şiyar bûm:

– Ji kerema we... Ka ji min re berxekî çêk!

– Çi!

– Ka ji min re berxekî çêk...

Ez çenk bûm ser xwe wek ku marekî bi min vedabûya. Min çavên xwe firikandin. Min xweşik nêrî. Min çi dît! Mirovekî biçûk, gelekî seyr, li ber min bû û li min mêze dikir. Va ye nigara wî ya herî biserketî ku paşê min çêkir. Lê ez çi bêjim, nigar bifire asmanan jî ew tucarî nagihêje toza bedewbûna mirovê ku min bi çavên serê xwe dît. Lê sûc ne sûcê min e. Di şeşsaliya min de û ji ber mezinan, dilê min ji nigarkişiyê sar bûbû. Tiştê ku ez hîn bûbûm, tenê çêkirina marên girtî û vekirî bû.

Min bi çavên nebawer û matmayî li mirovê li hember xwe nêrî. Ji bîr nekin ku ez bi hezarên mîlan ji avahiyan dûr bûm. Bi ser de jî, nîşanên windabûnê, westebûn, birçîbûn, tîbûn û tirsa pir ji binî ve li ser rûyê wî nexuyabûn. Wî yekcar nîşan


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

nedida ku ew lawikekî li sahrayê winda bû, lawikekî bi hezarên mîlan ji axa mirovan dûr bû. Gava zimanê min geriya, min jê re got:

– Kuro tu û van deran?

Û wî wilo bi nermî, wek ku wî tiştekî pir cedî bixwesta daxwaza xwe dubare kir:

– Ji kerema we... Ka ji min re berxekî çêk...


Gava mirov xwe li hember tiştekî ku ji binî ve nakeve seriyan bibîne, ew nikare bêje na. Wilo jî li gel ku ez ji hemû avahiyan dûr bûm û li gel tirsa ku ez li wê derê bimirim, min kaxezek û qelemek ji berîka xwe derxistin. Lê belê wê gavê hat bîra min ku tiştê ku min xwendibû bêtir zemînnasî, dîrok, hesab û rêziman bûn û min ji mirovê biçûk re (bi hinek bêhntengî) got ku min nizanî nigar çêbikirana. Wî li min vegerand:

– Xem nake. Ka ji min re berxekî çêk.

Ji ber ku berê min tucarî berx û mîh çênekiribûn, min ji wî re yek ji wan herdu nigarên ku min dizanîbûn çêbikirana çêkir: nigara marê boa yê girtî. Û ez gelekî mat mam gava mirovê biçûk li min vegerand û got:

– Na! Na! Ez fîlekî di zikê marekî boa de naxwazim. Marê boa gelekî xeterdar e û fîl jî gelek cîh digire. Li bal min pir biçûk e. Ez berxekî dixwazim. Ji min re berxekî çêk.

Wilo jî min çêkir.






Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org


Wî bi baldarî mêze kir û paşê got:
– Na! Ev ê hanê nexweş e. Yeke din çêke.
Min nigar çêkir:
Hevalê min bi rûyekî xweş bişirî û got:



– Tu xweş dibînî ku ev ne berx e.
Ev beran e. Biner qiloçên wî hene...
Min wilo nigara xwe ji nû ve çêkir:
Lê ew wek nigara pêşîn nehat qebûl kirin.
– Ev ê hanê gelekî pîr e.
Ez berxekî dixwazim ku pir jiyan li ber wî hebe.



Gerek bû ku min bi lez motorê xwe vekira û ji ber tunebûna wextê, min zû ev xêzên hanê çêkirin. Û min got:
– Va ye sindoq. Berxê ku tu dixwazî di hundirê wê de ye.




Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Lê ez gelekî mat mam dema min dît ku rûyê rexnegirê min yê biçûk ji kêfa vebû:

– Min ew eynî wilo dixwest! Tu bawer dikî ku gelek giha ji vî berxî re divê?

– Çima?

– Ji ber ku li bal min pir biçûk e...

– Bê guman wê bes be. Min berxikekî pir biçûk da te.

Wî serê xwe bi ser nigarê de xwar kir:

– Lê ne wiqasî biçûk e wek tu bawer dikî...Wey! Wa ew di xew re çû...

Wilo jî min mîrzayê biçûk nas kir.

## III

Ez zû bi zû tênegihaştim ew bi rastî ji ku derê dihat. Mîrzayê biçûk pir pirs dikirin û ji min re xuya bû ku wî guhê xwe yekcar nedida pirsên min. Di nav gotinên ku wilo dihatin ser zimanê wî, tişt hin bi hin ji min re eşkere bûn. Wilo jî, gava ew cara pêşîn çav li balafira min ket (Ez ê wêneya balafira xwe tucarî çênekim ji ber ku ew ê ji bo min gelekî zehmet be) wî ji min pirsî:

– Ev tiştê hanê çi ye?

– Ev ne tişt e. Ev difire. Ev balafira min e.

Û bi serbilindî min jê re rave dikir ku ez difiriyam. Wî wê gavê bi dengekî bilind got:

– Çawa? Na xwe tu ji asmanan ketiyî?

Min bi nefsbiçûkî vegerand:

– Erê.

– Wey! Kenê mirov bi vê yekê tê...

Û pirqîniyek xweşik bi mîrzayê biçûk ket. Lê bi wê pirqîniyê ez bêhnteng bûm. Ez naxwazim ku kesek henekê xwe bi derdên min bike û wan biçûk bibîne. Paşê wî berdomand:

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

– Na xwe tu jî ji asamanan hatîyî! Tu ji kîjan gerestêrê yî?



Wê gavê hebûyîna wî ya wilo seyr ji nişkê ve li wê dera dûr ji min re hinekî rohnak bû û min bi lez jê pirsî:

– Na xwe tu ji gerestêreke din î?

Lê wî li min venegerand. Wî serê xwe bi nermî hejand û li balafira min mêze kir:

– Rast e ku bi vî tiştî tu nikarî ji dereke dûr bêyî...

Paşê wî demeke dûr û dirêj xwe di nav pêlên ramanan de winda kir. Û wî berxê min ji bêrîka xwe derxist û bi kûranî li wê gencînê pir li ber dilê xwe giranbuha temaşa kir.

Hûn têdigihêjin çima ez gelekî mat bûm li ber van gotinên


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

nîvvekirî, nîvveşartî, gotinên wek "gerestêrên din". Min hewl da xwe ta ku ez bêtir tiştan nas bikim û min pirsî:

– Tu ji ku derê hatîyî, kurrê delal? " Li bal te" yanî li ku derê? Tu ê berxê min bi ku derê de bibî?

Wî piştî bêdengiyek ramantije li min vegerand:

– Tiştê baş di vê sendoqa ku te dayî min de ew e ku bi şev ew ê jê re bibe malik.

– Rast e. Û eger tu qenc bî, ez ê werîsekî jî bidime te ta ku tu wî bi roj girêbidî. Ez ê singekî jî bidime te.

Ji min re eşkere bû ku pêşniyariya min ji binî ve ne bi dilê mîrê biçûk bû û ew ji ber jî aciz dibû. Wî pirsî:

– Ez wî girêdim? Çi fikreke tewş!

– Lê eger tu wî girênedî ew ê bi her deverê de here û winda bibe...

Û car din pirqînî bi hevalê min ket:

– Ma ew ê bi ku derê here?

– Bi her derê. Bi çi devera ku bê ber wî...

Wê gavê mîrê biçûk bi giranî rave kir:

– Ne xem e, li bal min pir biçûk e!

Û bi dilekî, belkî, hinekî şikestî, wî berdomand:

– Eger mirov wilo tenê rast biçe, ew nikare wilo dûr here...


## IV

Min tiştekî din jî pir giring nas kir: gerestêra ku ew jê hatibû bi zorê ji xaniyekî mezintir bû!

Ez ji ber vê yekê gelekî mat nebûm ji ber ku min baş dizanîbû ku ji bilî gerestêrên mezin ên ku nav li wan hatibûn kirin wek Erdê, Muşterî, Merîx, Zuhrê, bi sedan gerestêrên din hene û di nav wan de wilo biçûk hene ku ew bi zorê bi dûrbînên asmanî tên xuyakirin. Gava stêrnasek yekê ji wan dibîne, ew di şûna navekî de hejmarekê didê. Wek nimûne, ew dikare jê re bêje "Stêra 3251".




Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org




 Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Gelek tiştan hiştin ku ez bawer bikim ku gerestêra ku mîrzayê biçûk jê dihat stêra B 612 bû. Ew stêrika hanê carekê tenê bi dûrbîna asmanî di 1909 de hatibû dîtin û yê ku ew peyda kiribû stêrnasekî tirk bû.




Wî wê gavê peydaya xwe di Civîna Navnetewî ya Stêrnasiyê de bi şêweyekî xurt dabû xuya kirin, lê, ji ber cil û bergên wî, baweriya tu kesî bi wî nehatibû. Mirovên mezin wilo ne.



Lê ji xêr û xweşbextiya stêra B 612 re, dîktatorekî tirk ferma-

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

nek ji bo miletê xwe derxist û di wê fermanê de, yê ku cil û bergên europî li xwe nekira, ji xwe ê bihata kuştin. Wilo jî, bi cil û bergine pir lihevhatî yê stêrnas di sala 1920an de dîsa peydaya xwe da xuyakirin. Û wê gavê, baweriya her kesî bi wî hat.



Eger min ji we re ev kitekitên hanê li ser stêra B 612 gotin û hejmara wê ji we re eşkere kir, ev yek ji ber xuyê mezinan e. Mirovên mezin ji hejmar û nimreyan hez dikin. Gava hûn ji wan re li ser hevalekî biaxivin, ew tucarî pirsan li ser tiştên bingehîn nakin. Ew tucarî ji we re nabêjin: "Gava ew diaxife, dengê wî çawa ye? Ew ji kîjan lîstikan bêtir hez dike? Gelo ew perwanan, pinpinîkan dide hev?"

Mirovên mezin di şûna van pirsan de dibêjin:"Ew çend salî ye? Çend birayên wî hene? Ew çend kîlo ye? Bavê wî di mehê de çiqas peran distîne?"

Ew tenê bi pirsên wilo bawer dikin ku dikarin xweş wî nas bikin. Eger hûn ji mezinan re bêjin: "Min xaniyekî ji kerpîçên pembeyî dît, ew xanî bi gulên şemedanî bû û kevokên spî li ser banê wî hebûn...", mirovên mezin nikarin xaniyekî wilo di serê xwe de çêbikin. Gerek mirov ji wan re bêje: "Min xani-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

yek dît hêja bû sed hezar frangên fransî." Wê gavê ew ê bi dengekî bilind bêjin: "Xwedêyo çi xaniyekî xweşik!"

Wılo jî eger hûn bixwazin rastiya hebûna mîrzayê biçûk ji wan re bipeyitînin û tenê bibêjin ku ew pir xweşik bû, ew dikeniya, wî berxek dixwest, mirovên mezin wê milên xwe bihejînin û ew ê we zarok bibînin. Lê eger hûn ji wan re bibêjin: "Gerestêra ku ew jê dihat stêra B 612 bû", ew ê wê gavê ji we bawer bikin û bi pirsên xwe serê we biêşînin. Mezin wilo ne. Gerek zarok dilê xwe ji wan negirin. Zarok gerek bi mezinan re dilovan û bêhnfireh bin.

Lê helbet em bi xwe, em jiyanê fêm dikin, em tu rûmetê nadin hejmar û nimreyan. Min ê bixwesta ev serpêhatiya hanê bi şêweya çîrokek ji çîrokên periyan dest pê bikira. Min ê bixwesta wilo bigota:

"Hebû nebû rehme li dê û bavê min û we bû. Mîrzakî biçûk hebû. Ew li ser stêrekê dijiya û ew stêr bi zorê ji wî mezintir bû. Ew mîrza, ji xwe re li hevalekî digeriya..." Ji bo kesên ku jiyanê fêm dikin, bêhna rastiyê ê bêtir ji van gotinên hanê bê.

Ez vê yekê dibêjim ji ber ku ez naxwazim ku yek bi çavekî biçûk li pirtûka min binere. Ez bi behskirina van bîranînan gelekî xemgîn dibim. Ev heye şeş sal ku hevalê min bi berxê min re çûye. Eger ez anuha dixwazim salixdana wî bidim, ez vê yekê dikim ji ber ku ez naxwazim wî ji bîr bikim. Ji bîr kirina hevalekî tiştekî xemtijî û zehmet e. Her kes nikare rojekê bêje "hevalekî min hebû". Ez jî rojekê dikarim bibim wek mirovên mezin ên ku tenê guh li hejmaran dikin. Ji ber vê yekê jî, min qutiyek rengên corbecor û qelem kirîn. Gava ez şeş salî bûm ez tenê hînî çêkirina nigarên marên boa ên girtî bûbûm û anuha Xwedê tenê dizane çiqasî bi min zehmet e ku ez dîsa li nigarkişiyê, li resmê, vedigerim! Helbet heta ji min bê, ez ê sûretê wî xweşik çêbikim û ez ê bixwazim ku ew nêzîkî rastiyê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

be. Lê ez bi giştî ji xwe ne bawer im ku ez ê bi ser kevim. Gava ez dinerim, ez çi dibînim? Ez dinerim ku nigarek baş tê û ya li dû ne wek wê ye. Ez li ser pîvanan jî hinekî xwe şaş dikim. Di nigarekê de mîrzayê biçûk gelekî mezin e, di ya din de, ew gelekî biçûk e. Ez li ser rengê çilên wî dudilî dibim. Wilo jî, wek koran, çi baş çi xerab, tiştê ku ji destê min tê, ez dikim. Bêguman ez ê li ser kitekitine pir giring jî xwe şaş bikim. Lê ez çi bikim, gerek hûn li min bubuhrin. Hevalê min tucarî tişt ji min re rave nedikir. Wî belkî bawer dikir ku ez wek wî bûm. Lê belê, mixabin, min nikarîbû wek wî di sindoqên girtî de berx bidîtana. Belkî ez hinekî wek mezinan bim. Bêguman ez pîr bûme.

## V

Her roj ez tiştekî nû li ser stêra wî, çûyîna wî, rêwîtiya wî hîn dibûm. Ew tiştên hanê ji ber xwe ve di nav gotin û nêrînan de hêdîka derdiketin. Wilo jî di roja sisiyan de min çîroka bela darên baobabê û serêşên mîrzayê biçûk nas kir.

Wê carê jî ew yek bi saya berx bû. Mîrzayê biçûk ji nişkê ve û bê destpêk, bi giranî, wek ku behsa tiştekî pir birûmet bikira, ji min pirsî:

– Rast e ne wilo ku berx şitilên daran dixwin?

– Belê. Rast e.

– Kêfa min ji vê yekê re tê.

Ez tênegihaştim çima pir girîng bû ku berxan dikarîbûn şitilên daran bixwarana. Lê mîrzayê biçûk berdomand:

– Na xwe ew darên baobabê jî dixwin?


Min wê gavê mîrzayê biçûk li ber xist ku darên baobabê ne darine biçûk bûn. Ew wek kelîsan mezin û bilind bûn û eger wî keriyekî fîl jî bi xwe re bibira, wî keriyê hanê ê nikarîbûya


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

tenê darek ji darên baobabê tev bikira.

Sûretê keriyekî fîlan kenê mîrzayê biçûk anî:

– Wê gavê gerek e ku fîl hemû li ser hev siwar bin...



Paşê wî bi zanebûn got:

– Darên baobabê, berî ku mezin bibin di destpêka xwe de biçûk in.

– Rast e! Lê çima tu dixwazî ku berx şitlên darên baobabê bixwin?

Wî li min vegerand wek ku wî dixwest bigota "Camêr ma pirs ji vê yekê re divê?" Gerek ez bi rastî gelekî jîr bûma ta ku min bi tenha serê xwe ew tişt fêm bikira.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org



Li ser gerestêra mîrzayê biçûk, wek li ser hemû gerestêrên din, gihayên baş û gihayên xirab hebûn. Wilo jî tovên baş gihayên baş didan û tovên xirab gihayên pîs didan. Lê tov bi çavan nayên dîtin. Ew di zikê erdê de veşartî ne û xewa xwe dikin, ta ku rojekê tê bîra yekê ji wan şiyar bibe...Wilo jî ew xwe vedizilîne, pêşî ajekî qelsî bêzar ber bi rojê hêdika bilind dike. Eger ajê biçûkî qels yê tivrê an gulê be, mirov dikare wî bihêle ta ku ew li gora dilê xwe dirêj û xurt bibe. Lê eger mirov nas bike ku aj yê darek pîs be, gerek e ku ew hema di wê deqê de wê ji qurmê wê de rake. Wilo jî li ser gerestêra mîrzayê biçûk tovine pir xirab hebûn...Ew tovên darên baobabê bûn. Zemîna gerestêra mîrzayê biçûk ji wî tovê wek moxilê bû. Wilo jî, eger mirov di destpêkê de zû çareyekê ji ajek baobabê re peyda neke, ji xwe ew nema tucarî jê xelas dibe. Eger




Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Xwedê neke ku hat û aj mezin bû, ew gerestêrê dadigire û wê bi rehên xwe qul dike. Û eger gerestêr biçûk be, û eger darên baobabê pir bin, ji xwe ew dar gerestêrê belawela dikin.

Paşê mîrzayê biçûk ji min re digot: "Pirs pirsa nîzamê ye. Piştî ku mirov sibehê xwe dişo û vedişo, gerek e ku ew paşê xweşik gerestêra xwe baqij û temîz bike. Gerek e ku ew zorê li xwe bike ta ku bi hawakî berdewamî darên baobabê ji qurm rake. Ew di destpêka xwe de pir bi ser darên gulan diçin û hema mirov wan ji hev derxîne gerek wan rake. Ev karê hanê gelekî nexweş e, lê belê karekî pir hêsan e."

Û rojekê wî pêşniyariyek li min kir û xwest ku min serê xwe bi wêneyeke xweşik bêşanda ta ku min xetera darên baobabê xweş têxista serê zarokên gerestêra xwe. Wî ji min re digot: "Eger rojekê ew bi deverêkê herin, ev yek wê bi kêrî wan bê. Carinan xem nake eger yek karê xwe yê îro bihêle rojeke din. Lê eger pirs bû pirsa darên baobabê, derengxistina kar wê herdem bobelatên mezin bi xwe re bîne. Min gerestêrek nas kir, mirovekî tembel li ser bû. Wî guh li sê şitilan nekiribû..."


Li gor daxwaziyên mîrzayê biçûk, min wêneya wê gerestêra hanê çêkir. Ez yekcar naxwazim tembîhan li xelkê bikim. Lê ji ber ku bi rastî kesek xweş xetera darên baobabê nas nake û eger yek rojekê xwe li ser gerestêrekê bibîne û wan ji bîr bike wê zehmetiyên pir mezin ji ber serê wan daran peyda bibin, min tenê wê carê xwest tembîhan bikim. Ez dibêjim: "Zarokno! Bila hayê we ji darên baobabê hebe!" Min pir serê xwe bi vê wêneya hanê êşand ta ku ez hevalên xwe agahdar bikim ku ji mêj ve xeterek nêzîkî wan û nêzîkî min bi xwe jî hebû. Dersa ku min dida hêja bû ku min zor li xwe bikira. Hûn ê belkî ji xwe bipirsin: çima di vê pirtûkê de nigarine din wilo xweşik û dilbir wek nigara darên baobabê tune ne?"





Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Bersiv hêsan e: min xwest lê ez çi bikim bi destê min derneket. Gava min nigara darên baobabê çêkir, ez dizanim ku taya lezê ez zeft kiribûm.



## VI

Ax! mîrzayê biçûk, ez hin bi hin bi ser jiyana te ya bi kul û derd vebûm. Di demeke dirêj de kêfxweşiya di jiyana te de tenê ew bû ku te ji xwe re li rokê dinêrî çawa diçû ava. Min ev kitekita hanê biyaniya roja çaran nas kir, gava te ji min re got:

– Ez ji roavaçûyînan hez dikim. Heydê em ji xwe re li rokê binerin bê çawa diçe ava...

– Lê gerek e em li bendî wê xwe ragirin...

– Li bendî çi?

– Li bendî rokê ta ku here ava.

Eşkere bû ku pêşî tu gelekî mat bûyî û paşê kenê te bi te hat. Û te ji min re got:

– Ez herdem bawer dikim ku ez hêna li bal xwe me!

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Rast e. Gava li Amerîkayê nîvro ye, her kes dizane ku rok, li Fransayê, dere ava. Eger wilo jî mirov bikaribe di deqakê de xwe ji Amerîkayê bigihîne Fransayê, ew ê bikaribe li rokê temaşa bike çawa diçe ava. Mixabin, Fransa têra xwe dûr e. Lê li ser stêrika te ya wilo pir biçûk, besî te bû ku tenê te sendeliya xwe çend gavan bikişanda. Û te ji xwe re, her gava ku dilê te dixwest, li rokê dinerî diçû ava...

– Rojekê, Min çil û sê caran dît ku çawa rok diçû ava!

Û hinekî paşê, te berdomand:

– Tu dizanî...Dema mirov gelekî xemgîn be, ew hez dike li avaçûna rokê binere...

– Na xwe wê roja çil û sê caran tu wiqasî xemgîn bûyî?

Lê mîrzayê biçûk vengerand.

## VII

Roja pêncan, herdem bi saya berx, sir û raza jiyana mirzayê biçûk ji min re diyar bû. Wî ji nişkê ve, bê destpêk, ji min pirsî, weke ku ew ji mêj ve li ser tiştekî ku di serê wî de baş stewiya bû hûr dibû:

– Eger berx ajan dixwe na xwe dikare gulan jî bixwe?

– Berx çi dikeve ber dixwe.

– Heta gulên bi stirî jî?

– Belê. Ew gulên bi stirî jî dixwe.

– Na xwe fêda stiriyan ma çi?

Min nizanîbû. Ez wê gavê bi mîxpêçê motorê xwe daketibûm wilo şidayî bû ku min dikir nedikir sist nedibû. Derdên min giran bûn ji ber ku aloziya motorê min hin bi hin ji min re dijwartir xuya dibû û ava vexwarinê tev dibû û ez ji tiştin dijwartir ditirsiyam.

– Naxwe fêda stiriyan maye?


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Mîrzayê biçûk gava pirsek dikir tucarî ji dû wê mirî venedigeriya. Ez ji ber mîxpêçê bêhnteng bûm û hema çi hat ser zimanê min min vegerand:

– Stirî, fêda wan tune. Ew tenê nedurist û pîsîtiya gulan didin xuya kirin!

– Çi!

Pêşî ew hinekî bêdeng bû û paşê wî bi qehr û kîn ji min re got:

– Ez ji te bawer nakim! Gul qels in. Ew kawik û sade ne, li gor tewanên xwe dilê xwe bi xwe xurt dikin. Di baweriya wan de ku ew bi wan stiriyên xwe dikarin her kesî ji xwe bitirsînin...

Min dengê xwe nekir. Min di wê kêlîka hanê de ji xwe re got: " Eger mîxpêç wilo asê bimîne, ez ê wî bi çakûçekî tenê hûrhûrî bikim." Mîrzayê biçûk dîsa ramanên min birrî.

– Û tu bi xwe, tu bawer dikî ku gul...

– Na! Na! Ez tutiştî bawer nakim! Çi hat ber devê min min got. Ez, ez serê xwe bi tiştên cedî dêşînim!

Wî matmayî li min nêrî:

– Te got tiştên cedî?

Wî li min dinêrî çawa çakûçê min di destê min de bû, çawa tiliyên min di nav zeyta reş de bûn, çawa min xwe bi ser wî tiştê ku ji wî re gelekî nexweşik bû xwar kiribû.

– Tu wek mezinan deng dikî?

Min hinekî ji ber xwe şerm kir. Lê wî bi dilekî hişk wek kevir berdomand:

– Tu her tiştî tevlihev dikî...Tu her tiştî tevlihev dikî!

Ew bi rastî gelekî bêhnteng bûbû. Wî porê xwe yê zêrînî li ber bê dihejand:

– Ez li ser gerestêrekê mirovekî sorî qirmizî nas dikim. Wî di temenê xwe de tucarî gulek bêhn nekiriye. Wî tucarî li stêrikekê neneriye. Wî tucarî ji kesekî hez nekiriye. Wî ji bilî

berhevkirina hejmaran di temenê xwe de tiştekî din nekiriye. Û rojê gişî ew hema wek te dubare dike û dibêje:

"Ez mirovekî cedî me! Ez mirovekî cedî me!" Ew bi vê yekê serê xwe pir bilind dike. Lê belê ew ne însan e, ew kvark e!"

– Ew çi ye?

– Ew kvark e!

Rûyê mîrzayê biçûk anuha ji ber bêhntengiyê bûbû hîzar.

– Ji milyonên salan gul stiriyan çêdikin.


Ji milyonên salan berx li gel hebûna stiriyan gulan dixwin. Ma ne tiştekî cedî ye ku mirov bixwaze bizanibe çima gul wiqasî xwe dêşînin ta wan stiriyên bêkêr çêdikin? Ma şerê gul û berxan şerekî bêrûmet e? Ma ew ji berhevkirinên Axayekî sorî qelew ne cedîtir e? Û eger li ser gerestêra min guleke hebe ku weke wê li dunyayê gişî tunebe, û eger berxekî biçûk bê ku bizanibe çi dike dikare rojekê wê bi hêsanî winda bike, ma ev tiştê hanê ne giring e?

Ew sor bû û paşê, wî berdomand:

– Gava guleke mirov hebe ku li ser milyon milyonên stêrikan ji bilî wê tu gulên din nebin, ew yek bes e ku ew mirov bextewer bibe dema lê binere. Wî ji xwe re got: " Gula min di dunyayê de li derekê ye..." Lê eger berx gulê bixwe, dunya ê li ber çavên wî mirovî tarî bibe, wek ku hemû stêrik ji nişkê ve bi hev re vemirin! Ma ev tiştê hanê ne mezin e?

Wî nema karîbû bêtir dengê xwe bikira û ji nişkê ve bû kûrekûra wî. Şev ketibû. Min dev ji hesinên xwe berdabû. Nema xema min bû ne çakûçê min, ne mîxpêça min ne tîbûn û ne mirin. Li ser stêrikekê, li ser gerestêrekê, ya min, li ser Erdê, mîrzadeyekî biçûk hebû û gerek bû ku min di ber dilê wî de bida! Min ew xist hembêza xwe. Min ew lorand. Min jê re digot: "Gula ku tu jê hez dikî ne di xeterê de ye...Ez ê ji wî re, ji berxê te re, devbendekê çêbikim...


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org



Ez ê ji gula te re kirasekî hesinî çêbikim...Ez ê..." Min nema xweş dizanîbû min ê çi bigota çi negota, ne çi bikira. Min nizanîbû çawa ew haş bikira, li ku derê xwe bigihanda wî. Bêxwedîka welatê hêsiran çiqasî welatekî nediyar û bi dûman e.

## VIII


Min zû ev gula hanê baş nas kir. Li ser stêra mîrzayê biçûk herdem gulên sade, gulên bi rêzek pelik hebûn. Wan gulan ne ciyekî mezin digirtin û ne kesek ji xwe nerehet dikirin. Ew di danê sibehê de di nav giha de hêşîn dihatin û danê êvarê dimirin. Lê belê, eva hanê, rojekê ji tovekî ku kesekî nizanîbû ji ku derê hatibû zîl dabû û mîrzayê biçûk baş ji nêzîkayî bala xwe dabû wî gihayê ku bi ser tu gihayên din de nediçû. Dibû

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ku ew tîjê hanê celebekî din ji darên baobabê bû. Lê ew aja hanê zû rawestiya, nema mezin bû û dest bi dana gulekê kir. Mîrzayê biçûk bi çavên serê xwe bi dilsojî dinêrî çawa wê ajê bişkoteke pir mezin da û dizanîbû ku wê tiştekî dûrî aqilan jê derketa. Lê belê gulê hema xwe kok dikir, di oda xwe ya kesk de hema dixemiland û rengên xwe heldibijart. Wê bi bêhna fireh xwe kok dikir, pelikên xwe yekoyeko rast û şayik dikir. Wê nedixwest wek gulebûkan qermîçokî bibişkuviya. Wê dixwest kengî payan ji xweşikbûna wê re nemaya wê gavê derketa. Erê çima na! ew guleke pir jixwehiz û dilnaz bû! Wê wilo jî xwe bi roj û şevan kok û xemiland. Û rojekê, di destê sibehê de, bi derketina rokê re, wê xwe da xuyakirin.

Lê erê wê bi roj û saetan xwe kok û tekûz kiribû û xwe ji wê kêlîka derketinê re amade kiribû, wê devbawişkî got:

– Ez nû ji xew radibim.





Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org



Li min bibuhure... Hîna porê min ne şehkirî ye.

Mîrzayê biçûk nizanîbû çawa hejmetkariya xwe li ber xweşikbûna wê bigirta û got:

– Tu çi xweşik î!

Gulê bi nermî vegerand:

– Ma ne wilo ye. Tu jî dibînî ku ez û rokê em bi hev re çêbûne...

Mîrzayê biçûk têderxist ku ew ne wiqasî nefsbiçûk bû, lê ew çi naz û dilrevîn bû!

Wê paşê berdomand:

– Ez bawer dikim ku wexta taştiya min e. Xwedê bike ku te haziriya min kiribe.

Û mîrzayê biçûk, şaşomaşo, rabû çû avreşan tije ava hênik kir û li ber destê gulê çû û hat.


Wê gulê ji destpêkê de bi pozbilindî û bedgumanên xwe ew êşandibû. Rojekê, wek nimûne, wê behsa her çar stiriyên xwe dikir û ji mîrzayê biçûk re gotibû:

– De bila piling bi navperûşkên xwe bên ku ez wan bibî-

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

nim!

Wê gavê mîrzadeyê biçûk lê vegerandibû:



– Piling li ser gerestêra min tunene, û paşê, piling giha naxwin.

Gulê bi dengekî nizim vegerand:

– Kê ji te re gotiye ku ez giha me?

– Li min bibuhure...

– Ez ji pilingan natirsim, lê ruhê min ji surrên bê diçe. Ma surreperdak li bal te tune ku tu ji min re bînî?

Mîrzayê biçûk di dilê xwe de got: "Çî bextekî reş eger gihayek ji surrên bê hez neke! Ev gula hanê gelekî tevlihev e..."

– Êvarê, tu ê min di bin cameke girover de binixumînî. Li bal te sar e. Ciyê te ne pir xweş e. Ji ciyê ku ez têm...

Lê wê gotina xwe zû birrîbû. Ew wek tovekê hatibû û wê tu dunyayên din bi rastî nas nekirbûn. Ji ber derewek wilo pir eşkere, ew li ber xwe ketibû û wê du–sê caran xwe kuxandibû û gotibû:

– Tu çi dikî vê surreperdê ji bo min nayênî?


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

– Min ê ew biyaniya ta te bi min re diaxivî!



Ta ku dîsa jî wê bihişta ku mîrzayê biçûk bêtir li ber xwe biketa, wê kuxika xwe xurtir kir.

Wilo jî mîrzayê biçûk, li gel dilxwazî û hezkirina xwe, zû jê ket şikê. Wî guhê xwe dabû gotinên wê ên vala û wilo jî gelekî xemgîn bûbû.

Wî rojekê derdê dilê xwe ji min re diyar kir: "Gerek min li gotinên wê guhdarî nekira. Gerek mirov tucarî guhê xwe nede gotinên gulan. Gerek ew tenê ji xwe re li wan binere û wan

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bêhn bike. Gula min bêhna xwe li hemû gerestêrê belav dikir û min nizanîbû giranbuhaya wê kêfxweşiyê nas bikira. Çîroka navperûşkan gelekî bêhna min teng kiribû lê paşê dilê min tenik kiribû..."



– Min tiştek fêm kir! Gerek min ew ne li gor gotinên wê lê li gor karûbarên wê ew bidîta. Wê min di nav bêhna xweş de dihişt û dilê min rohnî dikir. Gerek ez tucarî wilo nereviyama! Gerek min li paş fenên wê ên biçûk û bêzar tenikbûna dilê wê bidîta. Gul îro tiştekî dibêjin û sibe tiştekî din dibêjin! Lê belê ez gelekî ciwan bûm û min nizanîbû xweş jê hez kiriba."

## IX

Ez bawer dikim ku wî bi saya fira refek firendeyên bejî ji stêrika xwe bazda. Di sibeha roja çûyîna xwe de, wî gerestêra xwe baş rast kir. Wî argûn û bixêrîka agirfişanên (volkanên)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

xwe ên pêketî paqij kirin. Du agirfişanên wî ên pêketî hebûn. Ew ji bo germkirina taştê gelekî bi kêrî wî dihatin. Agirfişanekî wî vemirî jî hebû. Lê, wek ku wî digot: "Kî dizane!", wî ew jî paqij kir. Eger agirfişan xweş bên paqijkirin, agirê wan bi rengekî berdewam û wekhev herdem dişewite û tucarî wilo jî ew nacoşin. Coşanên burkanan wek agirên bixêrîkan in. Lê li ser erda me, eşkere ye ku em pir biçûk in ta ku em bikaribin argûnên burkanan paqij bikin û ji ber vê yekê jî, gava ew pêdikevin, ew gelek serêşan ji me re peyda dikin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Mîrzayê biçûk, bi dilekî hinekî şikestî, ajên dawîn ên darên baobabê rakirin. Wî di serê xwe de ji xwe re digot ku gerek ew tucarî venegeriya. Lê di danê wê sibehê de, hemû karûbarên rojane gelekî li ber dilê wî şîrîn xuyabûn. Û gava wî ji bo cara dawîn gul avda û xwest ew binuxumanda, ew kelegirî bû. Wî ji gulê re got:

– Xwedê negehdarê te be.

Lê wê dengê xwe nekir. Wî dubare kir:

– Xwedê negehdarê te be.

Gul kuxiya. Ew kuxuya lê belê ne ji ber ku wê serma xwaribû. Wê dawî dengê xwe kir û jê re got:

– Ez ehmeq û nezan derketim. Ez dixwazim ku tu li min bibuhurî. Di nav xêr û xweşiyê de bimîne!

Mîrzadeyê biçûk mat ma ji ber ku wê rexnên xwe wek hergav nekirin. Cam di dest de, ew bi heyrek mezin li wê derê ma û wî nizanîbû çi bikira çi nekira. Ew di wê nermiya wê ya bêdeng û bêrexne de nedigihaşt. Gulê got:

– Erê ez ji te hez dikim. Sûc sûcê min bû ku te ev yek nas nekir. Lê anuha ev ji binî ve bêqîmet e. Lê tu jî wek min ehmeq derketî. Bimîne di nav xêr û xweşiyê de... Dev ji vê camê berde. Ez nema wê dixwazim.

– Lê ba...

– Ez ne wiqasî nexweş im...Bayê hênik yê şevê wê ji bo min baş be. Ji bîr neke ku ez gulek im.

– Lê teba...

– Ez bêgav im du-sê kurmên daran hilgirim eger ez bixwazim rojekê pinpinîkan nas bikim. Dibêjin ku ew pir xweşik in. Eger ew neyên serlêdana min ma kî wê bê? Tu ê dûr bî. Eger pirs bê ser tebayên mezin, ez ji tiştekî natirsim. Ma ne navperûşkên min hergav hene.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Û wê bi dilekî sade û kawikî her çar stiriyên xwe nîşan dan. Paşê wê berdomand:

– Ma tu wilo wek seneman bi derewan li bendî çi yî? Here! Eger te biryara xwe û çûyînê daye, here, oxira ta ya xêrê be.

Wê ev yek got ji ber ku wê nedixwest ku mîrzayê biçûk çav li hêsirên wê biketa. Ew gul guleke pir pozbilind bû...

## X

Di wê navçeyê de, mîrzayê biçûk ne dûrî stêrikên 325, 326, 327, 328, 329 û 330î bû. Wî dest bi serlêdana wan kir ta ku bayek ji ber serê xwe berda û ji xwe re hînî tiştan bibûya.

Qiralek li ser stêrika pêşîn hebû. Xeftanekî sorî qaqimî lê, ew li ser textê xwe yê padîşahiyê rûniştî bû. Textê wî erê wilo sade bû lê di eynî wextê de gelekî kubar bû.

Qiral hema çav li mîrzayê biçûk ket bi dengekî bilind got:

– Va ye rajêrek, peyak.

Mîrzayê biçûk wê gavê ji xwe pirsî:

– Ma çawa ew dikare min nas bike eger tucarî berê çav li min neketiye?"

Wî nizanîbû ku ji bo padîşah û qiralan, cîhan giş gelekî sade dibû. Wilo jî, hemû mirov ji bo wan rajêr, peye bûn.

– Were nêzîkî min ta ku xweşik çavên min te bibînin. Qiral wilo bi kêf û serbilindiyek mezin jê re got ji ber ku, dawiya dawîn, ew li ser serê kesekî dibû qiral.

Mîrzayê biçûk bi çavên xwe li ciyekî rûniştinê geriya lê ji ber xeftanê qaqimî pir xweşik cîh li ser gerestêrê nemabû. Wilo jî ew bêgav bû li ser darên nigan ma û ji ber ku ew westiyayî bû, bawişkî bû.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Qiral jê re got:
– Na, ne li gor rêzikên dîwanê ye ku yek li hember qiral bawişkî bibe. Ez wê li te qedexe dikim.
Mîrzayê biçûk bi şermezariyek mezin got:
– Bawişkîbûyîn ne bi destê min e. Rêya min dirêj bû û xew bi çavên min nebûye...
Qiral jê re got:
– Vê gavê ez fermanê didime te ku tu bawişkî bibî. Ji mêj ve min nedîtiye kesek bawişkî dibe. Bawişkîbûyîn ji bo min tiştekî balkêş e. De ka bawişkî bibe, ev ferman e.
– Ez ketime bin şermê... Ez nema dikarim... Mîrzayê biçûk wilo got û rûyê wî gelekî sor bû.
Qiral vegerand:
– Na xwe wilo! Na xwe wilo! Vê gavê ez... ez fermanê didim ku carinan tu bawişkî bîbî û carinan...
Wî gotinên xwe xumxumand û eşkere bû ku ew bêhnteng bûbû.
Ew bêhnteng bûbû ji ber ku wî dixwest ku her kesî rûmeteke mezin bidaya desthilat û fermanên wî. Wî ji binî ve qebûl nedikir ku yekî serê xwe li ber fermanên wî rakira. Ew padîşaheke giştî bû lê ji ber ku ew gelekî rind bû, wî fermanine aqilane didan. Wî piraniya caran digot:
"Eger ez fermanekê derxînim û ji serdarekî bixwazim ku ew xwe bike firendeke deryayî û eger ew serdar fermana min bi cîh neke, çewitî wê ne ya serdar be. Ew ê ya min be.
Mîrzayê biçûk bi şermezarî pirsî:
– Ez dikarim danişim?
Qiral lê vegerand:
– Ez fermanê didim ku tu danişî.
Û wî bi giranî û meznayî perçak xeftanê xwe yê qaqimî ber bi xwe ve anî.
Lê mîrzayê biçûk devjihev mabû. Ew gerestêra hanê gelekî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

biçûk bû. Wî qiralî wê bi rastî li ser çi hukum bikira? Wî got:

– Şahê min... ez bexşînê ji we dixwazim ji ber ku pirsine min hene.

Qiral wê gavê bi lez got:



– Ez fermanê didim ku tu pirsan ji min bikî.

– Şahê min... Ma hûn li ser çi hukum dikin?

Qiral bi zimanekî pir sade bi lêv kir û bi destê xwe der û dora xwe nîşan da:

– Li ser hertiştî!

Mîrzayê biçûk got:

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

– Li ser hertiştî?
Û qiral lê vegerand:
– Belê li ser hertiştî...
Wilo jî ew ne tenê qiralekî giştî, lê qiralekî cîhanî, geytî bû.
– Û stêr bi fermana we dikin?
Qiral got:
– Helbet. Ew di cîh de bi ya min dikin. Ez ji binî ve bênîzamiyê qebûl nakim.
Karîn û tewanek wilo mezin mîrzayê biçûk mat hiştin. Eger desthilatiyek wilo di destê wî de hebûya, bê ku wî sendeliya xwe ji ciyê wê bikişanda, wî ê ne çil û çar caran, lê heftê û du caran, belkî sed an du sed carî di rojê de li avaçûna rokê temaşa bikira! Ji ber ku wî xwe hinekî xemgîn didît gava gerestêra wî ya bêxwedîmayî hate bîra wî, wî ceger kir ji qirêl bixwesta ku wî hêviyek wî bi cîh bikira:
– Ez dixwazim bibînim rok diçe ava...Kêfa dilê min bînin...Fermanê bidin ta ku rok biçe ava...
– Eger ez li serdarekî fermanê bikim ku ew mîna pinpinîkê ji gulekê bifire guleke din, an ku ew trajediyekê binivîse, an jî ku ew xwe bike firendeyekî deryayî û eger ew serdar fermanê bi cîh neke, ji me herduyan, çewtî ê ya kê be?
Mîrzayê biçûk bi baweriyek mezin got:
– Ew ê ya we be.
Qiral berdomand:
– Te rast got. Gerek em ji her yekî li gor tewanên wî tiştan bixwazin. Desthilatî berî her tiştî li ser aqil ava ye. Eger tu fermanê bidî miletekî û jê bixwazî ku ew xwe bavêje ava deryayê, ew milet ê di rûyê te de rabe û daxwaza te bişkîne. Mafê min heye ku ez bixwazim ku fermanên min bi cîh bibin ji ber ku fermanên min ne dûrî aqilan in.
Gava mîrzayê biçûk pirsek dikir, ew nema ji dû wê vedigeriya û wilo jî wî pirsa xwe dubare kir:

 Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

– Û daxwaza min û roavaçûyînê?

– Xwe ragire roavaçûyîna te wê bigihêje te! Ez ê fermana wê bidim. Lê li gor şeweya hukumdariya min, ez ê xwe ragirim ta ku mercên wê yekê peyda bibin. Bêhna fireh. Her tişt di wextê xwe de baş e.

Mîrzayê biçûk pirsî:

– Ew ê kengî be?

Qiral pêşî li salnameyeke mezin nêrî û paşê got: – Kengî! Kengî! Ew ê nêzîkî... nêzîkî... ew ê vê êvarê nêzîkî saet hef û çilî be! Û tu ê bi çavên serê xwe bibînî çawa fermanên min ê bi cîh bibin.

Mîrzayê biçûk bawişkî bû. Wî gelekî dixwest ew roavaçûyîna hanê bidîta. Paşê jî wî dest pê kiribû hinekî aciz dibû. Wî ji qiral re got:

– Tu karê min û vê derê nema. Ez ê herim!

Qiral serbilind bû ku rajêrekî wî, peyekî wî çêbûbû û got:

– Neçe, Neçe, ez ê te bikim wezîr!

– Wezîrê çi?

– Wezîrê...erê yê dadmendiyê!

– Lê kî li vê derê heye ta ku ez li ser serê wî bibim dadmend?

Qiral jê re got:

– Kî dizane! Ez hêna li der û dora memleketa xwe negeriyame. Ez gelekî pîr im, ciyê paytonekê li bal min tune û ez diwestim gava dimeşim.

Mîrzayê biçûk xwe xwar kir û wilo jî wî li aliyê din yê gerestêrê nêrî:

– Lê min dîtiye. Tukes li wê derê jî tune...

Qiral lê vegerand:

– Baş e, wê gavê tu ê bibî dadmendê xwe. Ji xwe ya herî zehmet ev e. Ew gelekî zehmetir e ku mirov biryarnamena di derheqa xwe de bide ku di derheqa kesên din de. Eger tu bi-

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

karibî baş xwe hukum bikî, ji xwe wê gavê tu ê mirovekî bi rastî gelekî zana bî.

Mîrzayê biçûk got:

– Ez li ku derê bim ez dikarim xwe hukum bikim. Ez ne bêgav im ji bo vê yekê li vê derê bijîm.

Qiral got:

– Baş e! Baş e! Ez bawer dikim ku li ser gerestêra min li derekê mişkekî pîr heye. Bi şev ez dengê wî dikim. Tu dikarî biryarnameyan di derheqa vî mişkê pîr de bidî. Tu ê carcaran hukmê mirinê lê bibirrî. Wilo jî, jiyana wî ê bi dadmendiya te ve girêdayî be. Lê her carê tu ê bexşînê jê re bînî ta ku ew sax bimîne. Ji bilî wî tu mişkên din tunene.

Mîrzayê biçûk vegerand:

– Ez, ez naxwazim fermana kuştinê bidim. Ez bawer dikim ku ez ê biçim.

Qiral got:

– Na, neçe.

Lê belê mîrzayê biçûk, piştî ku karûbarên xwe ên çûyînê kir, nexwest dilê padîşahê pîr bihişta:

– Eger padîşahiya we bixwaze ku fermanên wê gotin bi gotin bi cîh bibin, ew dikare di derheqa min de fermaneke aqilane derxîne. Ew dikare, wek nimûne, fermanê bide ku ez piştî deqakê ji vê derê bar bikim. Ez bawer dikim ku mercên fermaneke wilo peyda bûne...

Padîşah dengê xwe nekir û mîrzayê biçûk pêşî dudilî bû û paşê bi keservedan dest bi çûyîna xwe kir. Wê gavê qiral bi lez dengê xwe bilind kir:

– Ez te dikim sefîrê xwe.

Nîşanên desthilatiyê baş li ser rûyê wî xuya bûn.

Û mîrzayê biçûk di hemû dirêjahiya rêwîtiya xwe de ji xwe re got: "Mirovên mezin gelekî seyr û xerîb in".


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# XI

Miroveki pir jixwehiz li ser gerestêra duduyan dijiya:

– Va ye hejmetkarek tê serlêdana min!

Wî wilo got ji ber ku ji bo mirovên xwebîn, jixwehez, hemû mirovên din hejmetkarên wan in.

Mîrzayê biçûk got:


– Roj baş. Kumetê te xerîb e.

Mirovê xwebîn vegerand:

– Ew ji bo silavkirinê ye. Ew ji bo silavkirinê ye gava xelq ji min re li çepikan dixin. Lê mixabin kesek di vê derê re derbas nabe.

Mîrzayê biçûk tênegihaşt û vegerand:

– Belê?



– Li çepikan bixe, mirovê xwebîn ev pêşniyarî kir.

Mîrzayê biçûk rabû li çepikan xist. Yê xwebîn rabû bi nefsbiçûkî kumê xwe bilind kir û wilo jî silav kir.

Mîrzayê biçûk di nava xwe de ji xwe re got:

– Ev yek ji serlêdana yê qiral xweştir e.

Û wî dîsa li çepikan xist. Yê xwebîn dîsa kumê xwe ji bo silavkirinê bilind kir.

Wî karî pênc deqan dirêj kir û paşê dilê mîrzayê biçûk ji wê lîstikê sar bû. Wî pirsî:

– Û ta ku kum bikeve, gerek ez çi bikim?

Lê deng neçû yê xwebîn. Mirovên xwebîn tenê li pesin û şabaşiyan guhdarî dikin.

Wî ji mîrzayê biçûk pirsî:

– Ma bi rastî tu wiqasî hejmetkarê min î?

– Meneya hejmetkariyê çi ye?

– Meneya hejmetkariyê ew e ku tu bizanibî ku mirovê herî xweşik, herî bi cilên lihevhatî, herî dewletmend û herî jîr li ser gerestêrê ez im.

– Lê ji bilî te li ser gerestêrê kesekî din tune?

– Kêfa min bîne. Ne xem e. Dîsa hejmetkariya xwe ji min re bide xuyakirin!

Mîrzayê biçûk got û milê xwe hinekî hejand:

– Ez hejmetkarê te me. Lê fêda vê yekê wê li te çi be?



Û mîrzayê biçûk bi rêya xwe de çû.

"Eşkere ye ku mirovên mezin gelekî seyr û xerîb in", wî bi şêweyekî sade di hemû rêwîtiya xwe de ev yek ji xwe re got.

## XII

Li ser gerestêra din meyxurek hebû. Ev serlêdana hanê erê gelekî kurt bû, lê belê wê mîrzayê biçûk di nav xemgîniyek mezin de hişt.

Mirovê meyxur li ber qeyametek şûşên vala û qiyametek şûşên dagirtî rûniştî bû. Mîrzayê biçûk jê re got:

– Tu li vê derê çi dikî?

Yê meyxur bi mirûzekî tal lê vegerand:

– Ez vedixwim.

Mîrzayê biçûk jê pirsî:

– Çima tu vedixwî?

Yê meyxur lê vegerand:

– Ta ji bîr bikim.

Dilê mîrzayê biçûk hingê bi rewşa wî mirovê hanê dişewitî.

– Ta tu çi ji bîr bikî?

Yê meyxur got:

– Ta ku ez ji bîr bikim ku ez şerm dikim. Û wî serê xwe berda ber xwe.

– Şermkirina ji ber çi? mîrzayê biçûk ev pirs kir û dixwest bi

gaziya wî mirovî bihata.

Yê meyxur got:

– Şerma vexwarinê! Û paşê wî ji binî ve nema dengê xwe kir.

Û mîrzayê biçûk, heyrî, ji xwe re di hemû dirêjahiya rêya xwe de got: "Mirovên mezin bi rastî gelekî gelekî seyr û xerîb in".

## XIII

Gerestêra çaran ya mirovê karferma –biznisman– bû. Vî mirovî wiqasî xwe di nav karên xwe de winda kiribû ku wî serê xwe bilind nekir gava mîrzayê biçûk hat bal wî.

Mîrzayê biçûk jê re got:

– Roj baş. Çixara te vemirî ye.

– Sisê û dudo dibin pênc. Pênc û heft dibin duwanzdeh. Duwanzdeh û sisê panzdeh. Roj baş. Panszdeh û heft bîst û dudo. Bîst û dudo û şeş bîst û heyşt. Wextê min tune ez wê vêxînim. Bîst û şeş û pênc sî û yek. Of! Ev wilo dibe pênc sed û yek milyon şeş sed û bîst û du hezar û heft sed û sî û yek.

– Pênc sed milyon çi?



– Çi? Tu hêna li vê derê yî? Pênc sed û yek milyon ji... Ez nema dizanim...Xwedêyo çi karê min pir e! Ez, ez mirovekî cedî me, ez wextê bi tiştên vala winda nakim! Du û pênc heft...

Mîrzayê biçûk di temenê xwe gişî de ji dû pirsekê tucarî venegeriyabû. Wilo jî wî pirsa xwe dubare kir:

– Pênc sed û yek milyon çi?

Yê karferma serê xwe bilind kir:

– Pêncî û çar salên min li ser vê gerestêrê çêbûne û di van salan gişî de tenê ez sê caran hatime aciz kirin. Cara pêşîn berî bîst û du salan bû û ew ji ber mozqirtekê bû ku Xwedê tenê dizanîbû ew ji ku derê hatibû. Wê bi vinevina xwe ya gelekî ne xweş ez gêj kirim û min di berhevkirinekê de çar çewtî kirin. Cara duduyan berî yanzdeh salan bû bawîbûna min xurt bûbû. Ez gelekî nalivim. Wextê min û gertê tune. Ez cedî me, ez. Cara sisiyan... va ye! Min digot pênc sed û yek milyon...

– Milyonên çi?

Yê karferma têgihaşt ku xelasiya wî ji ber serê mîrzayê biçûk tunebû û got:

– Milyon ev tiştên biçûk ku carinan mirov wan li asmanan dibînin.

– Mêş?

– Na, ne mêş, ew tiştên biçûk ên ku diçirisînin.

– Mêşên hinguv?

– Na, ne mêşên hinguv, ew tiştên biçûkî zêrînî ên ku dihêlin ku kesên tembel xwe di nav xewnan de winda bikin. Lê ez, ez mirovekî cedî me! Wextê min ji bo xewnên vala tune.

– Ha! stêrik?

– Belê. Stêrik.

– Û tu çi dikî ji van pênc sed milyon stêrikan?

– Pênc sed û yek milyon şeş sed û bîst û du hezar heft sed û sî û yek. Ez cedî me, ez, pir deqîq im.

– Û tu çi dikî ji van stêrikan?

– Çawa ez çi dikim ji wan?

– Erê, tu çi dikî ji wan?

– Hîç. Ez xwediyê wan im, bes e.

– Na xwe wilo stêrik malên te ne?

– Belê.

– Lê min qiralek dît û wî...

– Qiral ne xwediyê tu tiştî ne. Ew tenê li ser tiştan "hukum"dikin. Ev herdu tişt gelekî ji hev cihê ne.

– Û fêda wê çi ye ku wiqas stêrikên te hebin?

– Ew dihêlin ku ez zengîn bibin.

– Û fêda wê çi ye ku tu zengîn bî?

– Fêda wê ew e ku ez dikarim stêrikine din bikirim, eger kesek wan peyda bike.

Mîrzayê biçûk di nava xwe de ji xwe re got ku ev yê hanê bi çavên mêyxurekî serxweş tiştan dibîne.

Lê belê wî dîsa pirs kirin:

– Çawa mirov dikare bibe xwediyê stêrikan?

– Ma ji te we re ew wilo berdayî û bêxwedî ne? karferma bi mirûzekî tal vegerand.

– Ez nizanim. Ew ne yê tukesî ne.

– Wê gavê ew yên min in, ji ber ku ez mirovê pêşîn bûm ku ez bi wan fikirîm.

– Ma ev yek bes e?

– Helbet! Gava tu almasekê bibînî û ew ne ya tukesî be, ew ji te re ye. Gava tu giravekê bibînî û ew ne ya tukesî be, ew ji te re ye. Gava fikreke ji bo cara pêşîn di serê te de çê bibe, tu dikarî wê qeyd bikî û ew dibe ya te. Stêrik jî yên min in ji ber ku berî min kesekî bîr nebiribû wan bike yên xwe.

Mîrzayê biçûk got:
– Ev yek rast e. Û tu çi dikî ji wan?
Yê karferma got:
– Ez wan îdare dikim. Ez wan dijmêrim û dijmêrim. Ev zehmet e. Lê ez miroveki cedî me!
Dilê mîrzayê biçûk hêna neketibû cîh.
– Yê min bi xwe, eger milpêçek min hebe, ez dikarim wê li dora qirika xwe girêdim û wê bi xwe re bigerînim. Yê min bi xwe eger guleke min hebe, ez dikarim wê biçînim û wê bi xwe re bibim. Lê tu, tu nikarî stêrikên xwe bidî hev!
– Na, lê ez dikarim wan di bankê de têxim ser hesabê xwe.
– Meneya vê yekê çi ye?
– Meneya vê yekê ew e ku ez li ser kaxezek biçûk hejmara stêrikên xwe dinivîsînim. Paşê ez vê kaxeza hanê dixim çaviyekê û kilît dikim.
– Hew wilo?
– Ev bes e!
Tiştekî xweş e, mîrzayê biçûk di serê xwe de ji xwe re got. Ev tiştekî têra xwe helbestî, şayirane ye. Lê belê bi rastî ne cedî ye.
Nêrîn û dîtinên mîrzayê biçûk li ser tiştên cedî gelekî cihê bûn ji dîtin û nêrînên mezinan. Wî dîsa got:
– Ez bi xwe xwediyê gulekê me û her roj wê avdidim. Ez xwediyê sê agirfişanan im û ez her hefte argûnên wan paqij dikim. Ji bîr meke ku ez ta yê vemirî jî paqij dikim. Kî dizane. Ji bo agirfişanên min û gula min ew tiştekî baş e ku ez xwediyê wan bim. Lê tu tu fêdê nagihînî stêrikan...
Karferma devê xwe vekir lê nizanîbû çawa vegeranda. Mîrzayê biçûk ji xwe re di hemû dirêjahiya rê de digot ku mirovên mezin bi rastî bêtixûb seyr û xerîb in.

## XIV

Gerestêra pêncan gelekî balkêş bû. Ew di nav gişan de ya herî biçûk bû. Li ser wê tenê ciyê stûnê çirakê û rohnîkirê çiran hebû. Mîrzayê biçûk nikarîbû têbigihaşta fêda stûneke çirayê û rohnîkirekî çiran di wî asmanê fireh de, li ser gerestêrek bêkes û bêxanî çi bû. Lê belê wî ji xwe re got:

– Belkî ev mirovê hanê mirovekî tewş û gêj be. Lê çawa be, ew ji qiral û xwebîn û karferma û ji meyvexur ne tewş û gêjtir e. Bi kêmanî meneyeke ji karê wî re heye. Gava ew çira xwe vêdixe, ew wek ku stêrike din an guleke din diaferîne. Gava ew çira xwe vedimirîne, ew gulê an stêrê di xwe re dike. Ev karûbarekî xweşik e. Ev bi rastî hêja ye ji ber ku ew xweşik e.

Gava ew daket ser gerestêrê, wî bi rûmeteke mezin silav li rohnakirê çiran kir:

– Roj baş. Çima te anuha çira xwe vemirand?

Rohnîkerê çiran vegerand:

– Destûra kar ev e. Roj baş.

– Kar çi ye?

– Vemirana çira min e. Şevbaş, yê rohnîkirî vegerand.

Û wî dîsa çira pêxist.

– Lê çima anuha te ew dîsa pêxist?

Rohnîkerê çiran vegerand:

– Destûra kar ev e.

Mîrzayê biçûk got:

– Ez tênagihêjim.

Rohnikerê çiran got:

– Ma çi heye ta ku tu bixwazî têbigihêjî? Destûra kar destûra kar e. Roj baş.

Û wî çira xwe vemirand.


Paşê wî xwêdana aniya xwe bi destmaleke bi damikên sor zuha kir.

– Karê min karekî pir dijwar e. Berê ew karek bû ku diket seriyan. Min sibehê vedimirand û êvarê pêdixist. Wilo jî di saetên mayîn ên rojê de min xwe rehet dikir û di saetên mayîn ên şevê de min ji xwe re xew dikir...

– Û, ji wê demê de destûra kar hate guhertin?

Rohnikerê çiran got:

– Destûra kar nehatiye guhertin. Ji xwe bela mezin ev e! Gerestêrê sal bi sal zûtir li dora xwe geriya û destûra kar nehat guhertin!



Mîrzayê biçûk got:

– Vêca çi?

– Vêca anuha ku ew her deqê carekê li dora xwe digere, ez nikarim saniyekê çi ye ji xwe re rûnêm. Ez di her deqê de carekê vêdixim û careke vedimirînim!

– Ev tişt bi rastî seyr û xweş e! Na xwe roj li bal te tenê deqakê dirêj dikin.

Rohnîkerê çiran got:

– Ev tişt bi rastî yekcar ne seyr e û ne xweş e. Ev meheke me ye ku em bi hev re diaxivin.

– Te got mehek?

– Belê. Sî deqe. Sî roj! Şev baş.

Û wî dîsa çira xwe pêxist.

Û mîrzayê biçûk li rohnikerê çiran nêrî û kêfa wî jê re hat. Wî ji karkerê wefadar hez kir. Roavaçûyînên ku berê ew li wan digeriya û ji bo wan wî sendeliya xwe dikişand hatin bîra wî. Wî xwest alîkariya hevalê xwe bikira:

– Tu dizanî... Ez çareyekê ji bo te nas dikim û dizanim çawa tu ê bikaribî xwe rehet bikî her gava ku dilê te bixwaze.

Rohnîkerê çiran got:

– Ez vê yekê helbet dixwazim, de ka bêje çi ye.

Wî got ji ber ku mirovê wefadar dibe ku di eynî wextê de jî mirovekî tembel be.


Mîrzayê biçûk berdomand:

– Gerestêra te pir biçûk e û bi sê gavan tu dikarî li dorê bigerî. Tu dikarî tenê hêdî hêdî ji xwe re bimeşî û wilo jî wê herdem li ber te roj be. Gava tu bixwazî xwe rehet bikî, tu ê bimêşî û...û roj ê li gor daxwaza te dirêj bibin.

– Ev yek birîna dilê min derman nake. Li ser rûyê dunyayê, tiştê ku ez jê hez dikim, tenê xew e.

Mîrzayê biçûk got:

– Bextê reş reş e.
Rohnîkerê çiran got:
– Bextê reş reş e. Roj baş.
Û wî çira xwe vemirand.
Mîrzayê biçûk paşê di dirêjahiya rêwîtiya xwe de got: "Ev ê hanê wê di çavên gişan de biçûk bibe. Ew ê di çavên qiral, jixwehez, meyxur û karferma de wê biçûk bibe. Lê belê di nav wan de ew yê yekêmîn e ku kenê min pê nayê. Belkî ji ber ku ew ne bi nefsa xwe lê bi tiştekî din xerîk dibe.
Bi poşmanî, wî keserek germ veda û ji xwe re got jî:
– Min tenê ev yê hanê dikarîbû ji xwe re bikiraya heval. Lê gerestêra wî bi rastî pir biçûk e û ciyê du kesan li ser tune...
Tiştê ku mîrzayê biçûk bêtir lê poşman dibû û ku nedwêrîbû ji xwe re bigota, ew bû ku ew li wan hezar û çar sed û çil carên ku rok di bîst û çar saetan de diçû ava poşman dibû!



Gerestêra şeşan bi deh caran ji ya berî xwe mezintir bû. Mirovekî, Axayekî pîr li ser bû û wî qerasên pirtûkan dinivisandin. Gava ew çav li mîrzayê biçûk ket, wî bi dengekî bilind

got:

– Va ye cîhangerokekî kaşif!

Mîrzadeyê biçûk li ser masê rûnişit û hinekî bêhna xwe vekir. Ew hingê têra xwe geriyabû!

Axayê pîr jê pirsî

– Tu ji ku derê têyî?

Mîrzayê biçûk got:

– Ev zirqerasa pirtûkê ya çi ye? Hûn li vê derê çi dikin?

Axayê pîr got:

– Ez coxrafiyazan im.

– Coxrafiyazan çi ye?

– Ew zaneyeke ku ciyê deryayan, çeman, bajaran, çiyan û sehrayan nas dike.

Mîrzayê biçûk got:

– Va ye bi rastî tiştekî gelekî balkêş. Ev cara pêşîn e ku ez çav li karekî rastîn dikevim!

Û wî çavên xwe li hawirdora gerestêra wî coxrafiyazanî gerand. Wî berê tucarî bi çavên serê xwe gerestşereke wilo xweşik nedîtibû.

– Gerestêra we têra xwe xweşik e. Gelo oqyanos lê hene?

Coxrafiyanas got:

– Ez ê ji ku bizanibim.

– Ah! (Dilê mîrzayê biçûk hinekî ma.) Û Çiya?

Coxrafiyazan got:

– Ez ê ji ku bizanibim.

– Û bajar û çem û sehra?

Coxrafiyazan got:

– Ez ê van jî ji ku bizanibim.

– Lê hûn coxrafiyazan in!

Coxrafiyazan got:

– Rast e, lê ez ne kaşif im. Pir karê min bi cîhangerok û kaşifan heye. Ew ne karê coxrafiyazan e ku ew here li bajar û

çem û çiya û derya û oqyanos û biyabanan bigere. Rûmeta yê coxrafiyazan gelekî ji wilo mezintir e ta ku ew here li deran bigere. Ew ji nivîsgeha xwe nalive. Lê li wir cîhangerok û kaşifan tên ba wî. Ew pirsan ji wan dike û têbînan ji ber bîranînên wan digire. Û eger bîranînên yekî ji wan bala wî bikişînin, ew vekolînekê li ser sinc û axlaqê yê kaşif vedike.

– Ev ji bo çi?

– Ji ber ku eger kaşifek derewan bike, ew ê afetine mezin ji yê coxrafiyazan re peyda bike. Û eger kaşifek gelekî ji meyê hez bike û vexwe.

– Ev ji bo çi?

– Ji ber ku yên serxweş cot dibînin. Wilo jî, yê coxrafiyazan di şûna çiyakî de ê duduyan binivîsîne.

– Ez yekî nas dikim û dizanim ku ew ê bibe kaşifekî gelekî kambax.

– Ne dûr e. Wilo jî, gava yê kaşif xwediyê sinc û axlaqekî rind be, mirovên coxrafiyazan lêkolînekê li ser peydaya wî çêkirin.

– Ew diçin bi çavên serê xwe dibînin?

– Na. Ev yek pir tevlihev e. Lê ji yê cîhangerok tê xwestin ku ew peydaya xwe baş bipeyitîne. Eger, wek nimûne, ew behsa çiyayekî mezin bike, wê jê bê xwestin ku ew kevirine mezin bîne.

Coxrafiyazan ji nişkê ve bi dilpekînî got:

– Lê tu, tu ji dûr hatiyî! Tu cîhangerok î! Tu ê ji min re salixdana gerestêra xwe bidî!

Coxrafiyazan pelekî nû ji defterqeyda xwe vekir û serê qelema xwe baş birrî. Wî paşê got: “ Em pêşî biserhatiyên kaşifan bi qelema resas dinivîsînin. Em xwe radigirin ta ku yê kaşif gotinên xwe bipeyitîne, ta ku paşê, em wan gotinan bi hibrê binivîsînin.

Coxrafiyazan xwest:

– Fermo de ka bêje!
Mîrzayê biçûk got:
– Ez ê çi bêjim? gerestêra min ne wiqasî balkêş e. Ew gelekî biçûk e. Sê agirfişanên min hene. Dudo ji wan vêketî ne û yek vemirî ye. Lê mirov tucarî baş nizane.
Coxrafiyazan got:
– Mirov tucarî baş nizane.
– Guleke min jî heye.
Coxrafiyazan got:
– Em gulan qeyd nakin.
– Çima na! Tiştê hemû xweşik ji xwe ew e.
– Ji ber ku gul yekrojane ne.
– Meneya "yekrojane" çi ye?
Coxrafiyazan got:
– Pirtûkên coxrafiyazanan ji hemû pirtûkên din çêtir û giranbuhatir in. Ew tucarî kevin nabin û ji rûmeta xwe nakevin. Ew gelekeî kêm e ku çiyak rojekê ciyê xwe biguherîne. Ew pir kêm e ku ava oqyanosekê bimiçiqe. Em bi xwe tiştên nemir dinivîsînin.
Mîrzayê biçûk gotina wî birrî:
– Lê agirfişanên vemirî dikarin rojekê şiyar bibin. Meneya "yekrojane" çi ye?
Coxrafiyazan got:
– Agirfişan çi vemirî çi pêketî, ew bi xwe ji bo coxrafiyazanan wekhev in. Çiya ji bo me girîng e. Ew nayê guhertin.
Mîrzayê biçûk di temenê xwe gişî de gava pirsek dikir ew tucarî ji dû wê pirsê venedigeriya. Wî pirsa xwe dubare kir:
– Lê meneya "yekrojane" çi ye?
– Meneya wê "Tiştê ku dibe di demeke nêzîk de ji ber çavan winda bibe."
– Gula min na xwe dibe ku di demeke nêzîk de ji ber çavan winda bibe?

– Helbet.

Mîrzayê biçûk ji xwe re got: “Gula min yekrojane ye û ji bilî her çar stiriyên wê tiştekî wê din tune ku wê biparêze! Wax li min! Min ew bi tenha serê wê li bal xwe hiştiye!”

Ew cara yekem bû ku poşimanî di nava wî de peyda dibû. Lê wî dilê xwe xurt kir:

– Hûn ê pêşniyariyê kîjan deverê li min bikin ku ez biçim wir?

– Gerestêra Erdê, coxrafiyazan lê vegerand. Navûdengê wê bi başiyê derketiye...

Û mîrzayê biçûk, gula wî hergav di bîra wî de, bi rêya xwe de çû.

## XVI

Gerestêra heftan wilo jî Erd bû. Erd gerestêreke ne wek her gerestêrê ye! Li ser Erdê sed û yanzdeh qiral hene (Helbet bê ku ez qiralên reşan ji bîr bikim), heft hezar coxrafiyazan hene, neh sed hezar karferma hene, heft milyon û nîv meyxurên serxweş hene, sê sed û yanzdeh milyon jixwehez hene, ango bigiştî, nêzîkî du milyard mirovên mezin li ser rûyê Erdê hene.

Ta ku ez nêrînekê di serê we de li ser mezinbûna Erdê çêbikim, ez ê ji we re bêjim ku berî derketina eletrîkê, li ser her şeş qareyên wê ordiyek ji çar sed û şêst û du hezar û pênc sed û yanzdeh rohnîkerên çiran hebûn û wan rohnîkeran nanê xwe ji karê xwe dixwarin.

Gava yekî hinekî ji jor li tevgerên van leşkeran bineriya, dîmeneke gelekî xweşik jê re xuya dibû. Tevgerên vê urdiyê giş bi dûzan û destgeh bûn û mîna endamên dîlaneke operayê her yekî karê xwe dikir. Pêşî dibû dora rohnîkerên çirayên Ze-

landa Nû û Austiraliyayê. Piştî ku van rohnîkeran fanosên xwe vêdixistin, ew diçûn ji xwe re radizan. Paşê rohnîkerên Çînê û Sîbîryayê diketin govendê û piştî ku wan çirên xwe vêdixitin, ew li pişt perda teatroyê winda dibûn. Paşê dibû dora rohnîkerên çirên Rûsiya û Hindistanê. Paşê yên Afriqa û Europayê. Paşê ên Amerîka Başûr. Paşê yên Amerîka Bakur. Û wan tucarî xwe di newbeta derketina xwe de ser sehnê şaş nedikirin. Ew tişt bêpîvan dilrevîn bû.

Tenê rohnîkerê çira tek ya qutbê Bakur û hevkarê wî yê çira tek ya qutbê Başûr jiyaneke tembelî û bêkarî derbas dikirin: Wan di salê gişî de tenê du caran kar dikirin.

## XVII

Gava yek bixwaze xwe pir jîr û zane bide xuyakirin, dibe ku ew carinan derewan jî bike. Gava min behsa rohnîkerên çiran kir, ez bi we re ne gelekî rast û dilpaqij bûm. Dibe ku ez nêrînên çewt li ser gerestêra me bidim kesên ku wê nas nakin. Ger herdu milyardên ku li ser rûyê erdê dijîn şipya û hinekî bi ser hev de, wek di civîneke siyasî de guvaştî bin, ew ê bi hêsanî têkevin meydaneke umûmî bi dirêjbûn û bi pehnbûna bîst hezar mîlî. Mirov ê bikaribe hemû mirovên li ser rûyê erdê têxe girava herî biçûk ji nav giravên oqyanosa Aram.

Mirovên mezin, helbet, wê ji we bawer nekin. Di baweriya wan de ew ciyekî mezin digrin. Ew xwe wek darên baobabê tirtire dibînin. Eger hûn pêşniyariyekê ji wan re bikin û ji wan bixwazin ku ew hesab bikin, ew ji xwe hejmarperest in û bi wê yekê ê pir kêfa wan bê. Lê wextê xwe bi derewan bi teşqelên vala winda nekin. Baweriya we bi min tê û ev bes e.

Gava mîrzayê biçûk gihaşt ser rûyê erdê, ew mat ma ji ber ku ew çav li tukesî neket. Ew hingê dilbitirs bû ku wî xwe şaş



kiribû û çûbû ser gerestêreke din gava li ser xîzê xelekek di rengê heyvê de liviya.

Mîrzayê biçûk hema wilo ji ber xwe ve got:

– Şeva te bimîne xweş.

Mar got:

– Şeva te bimîne xweş.

– Ez li ser kîjan gerestêrê ketime? Mîrzayê Biçûk pirsî

Mar vegerand:

– Li ser Erdê, li Afrîqayê.

– Na xwe kesek li ser rûyê Erdê tune?

Mar got:

– Bizanibe ku ev der biyaban e. Li biyabanan kes tune. Erd mezin e.

Mîrzayê biçûk li ser kevirekî rûnişt û rûyê xwe ber bi asmanan ve kir.

– Gelo stêrik wilo rohnîkirî ne ta ku her kes bikaribe rojekê stêra xwe bibîne. Li gerestêra min biner. Ew di ser serê me re ye...Lê Xwedê dizane ew çiqasî dûr e!

Mar got:

– Ew xweşik e. Tu hatiyî vê derê çi bikî?

Mîrzayê biçûk got:

– Zehmetiyine min û gulekê hene.

Mar got:

– Na xwe wilo!

Û wan nema dengê xwe kirin.

Paşê, mîrzayê biçûk dîsa dengê xwe kir:

– Lê ka insan li kuderê ne? Mirov li sehrayê hinekî xwe tenê dibîne...

Mar got:

– Li bal însanan jî mirov xwe tenê dibîne.

Mîrzayê biçûk demeke dirêj lê nêrî:

– Tu jî newerekî seyr û xerîb î. Tu wek tiliyekê zirav î...

Mar got:

– Lê ez ji tiliya qiralekî bihêztir im.


Mîrzayê biçûk di ber xwe de keniya:

– Bawer meke ku tu wiqasî bihêz î... Nig jî ji te kêm in... Tu nikarî dûr jî biçî...

Mar got:

– Ez dikarim ji gemiyekê bêtir te dûr bibim.

Wî xwe li dora gwîzeka mîrzayê biçûk mîna xilxalekî zêrînî pêçand. Wî dîsa got:



– Mirovê ku ez destê xwe bidimê, ez wî vedigerîm axa ku ew jê hatiye. Lê tu dilpak î û tu ji stêrekê ketiyî...

Mîrzayê biçûk tiştek venegerand. Mar berdomand:

– Dilê min bi te dişewite, tu yî wiqasî qels û belengaz li ser vê Erda kevirên hişk. Ez dikarim alîkariya te bikim eger rojekê tu pir li gerestêra xwe poşman bibî. Ez dikarim...

Mîrzayê biçûk got:

– Baş e, min fêm kir. Lê çima tu herdem bi gotinên sergirtî diaxifî?

Mar got:

– Ez dikarim wan gişan vekim û meneya hemû wersiran bidim.

Paşê ew herdu bêdeng man.

## XVIII

Mîrzayê biçûk di sehrayê re derbas bû û pêrgî gulekê hat. Guleke bi sê pelikan, guleke pîsik ku ne hêja bû qirşikekî...

Mîrzayê biçûk got:

– Rojbaş.

Gulê vegerand:

– Rojbaş.

Mîrzayê biçûk bi tore pirsî:


– Ka mirov li kuderê ne?

Gulê rojekê, karwanek dîtibû di wê derê re derbas bûbû:

– Mirov? Ez bawer dikim li ser rûyê erdê ew tenê şeş heftek in. Berî çend salan ez carekê çav li wan ketim. Lê kesek nizane wan li ku derê zeft bike. Ba wan digerîne. Reh ji wan re tunene û ji ber vê yekê ew gelekî narehet in.

Mîrzayê biçûk got:

– Xwedê negehdarê te be.



Gulê vegerand:
– Xwedê negehdarê te be.

## XIX

Mîrzayê biçûk bi çiyayekî berz û bilind hilkişiya. Çiyayên ku berê wî nas dikirin tenê her sê agirfişanên wî bûn û ew bi xwe bi zorê digihaştin çoka wî. Û wî agirfişanê vemirî ji xwe re kiribû sendelî li ser rûdinişt. “Li ser çiyakî wek vî çiyayê bilind, wî ji xwe re wilo got, ez ê bi carekê gerestêrê û hemû mirovan bibînim...” Lê li serê wî çiyayî ew tenê çav li pîjên serê tehtan ket.

Wî hema ji ber xwe ve got:
– Rojbaş.
Sedayê vegerand:
– Rojbaş...Rojbaş...Rojbaş...

Mîrzayê biçûk got:

– Hûn kî ne?

Sedayê vegerand:

– Hûn kî ne...hûn kî ne...hûn kî ne...

Wî got:

– Bibin hevalên min, ez bi tenê me.

Sedayê vegerand:

– Ez bi tenê me...ez bi tenê me...ez bi tenê me.

Mîrzayê biçûk wê gavê di serê xwe de ji xwe re got: "çi gerestêreke seyr û xerîb! Ew wilo zuha, tûj û şor e. Mirovên wê bêxeyal in. Ew hema tiştên ku ji wan re tên gotin dubare dikirin... Li bal min gulek min hebû: herdem ew ya pêşîn bû ku diaxifî..."

## XX

Lê piştî ku mîrzayê biçûk gelekî meşiya, piştî ku wî xîz û teht û berf derbas kirin, ew dawiya dawî rastî rêyekê hat. Rê jî ji xwe herdem ber bi mirovan diçin.

Wî got:

– Rojbaş.

Ew bexçeke gulan bû. Gulan vegerandin:

– Rojbaş.

Mîrzayê biçûk li wan mêze kir. Ew gul hemû wek gula wî bûn. Wî matmayî ji wan pirsî:

– Hûn kî ne?

Gulan vegerandin:


– Em gul in.

Mîrzayê biçûk got:

– Ha!..

Û wî xwe gelekî belengaz dît. Gula wî jê re gotibû ku ji tovê





wê ew tenê li dunyayê hebû. Û va ye ku tenê di bexçakî de, pênc hezar gulên wekhev û wek wê, hebûn!

Wî ji xwe re got: "Ew ê dilê xwe bigire eger ew çav li vî bexçeyî bikeve... Ew ê gelekî bêhawe jî bikuxe û ta ku kesek pê nekene wê xwe li mirinê deyîne. Û ez ê rebenê Xwedê bêgav bibim jê re xuya bikim ku ez lê miqate me, ji ber ku eger ne wilo be, ta ku ew min bêşîne, ew dikare bi rastî xwe bikuje..."

Paşê wî dîsa ji xwe re got:

"Ji ber gulekê ku min bawer dikir ku wek wê tu gul tunebûn, min xwe dewletmend didît û ez anuha dibînim ku bi rastî bi hezaran gul wek wê hene. Bi ser de jî, bi her sê agirfişanên xwe ên digihêjin çoka min û yê vemirî jî belkî tucarî

pênekeve, erê bi van hemû tiştan mîrzayekî mezin ji min çênabe..."

Û wî xwe li ser giha dirêj kir û giriya.



## XXI

Di wê gavê de bû ku rovî xuya kir û got:

– Rojbaş.

– Rojbaş. Mîrzayê biçûk bi tore vegerand û bê ku çav li tukesî biketa wî li dora xwe nerî. Deng hat:

– Ez va me, ez li bin dara sêvê me...

Mîrzayê biçûk pirsî:


– Tu kî yî? Tu çi xweşik î...

Rovî got:

– Ez roviyek im.

– Were em ji xwe re bi hev re bilîzin, mîrzayê biçûk ev pêşniyariya hanê lê kir. Ez gelekî dilşikestî me...

Rovî got:



– Ez nikarim bi te re bilîzim. Ez ne kedîkirî me.

Mîrzayê biçûk got:

– Ah! bibuhmure.

Lê ew ramiya û paşê, wî berdomand:

– Meneya "kedîkirinê" çi ye?

Rovî got:

– Tu ne ji vê derê yî. Tu li çi digerî?

Mîrzayê biçûk got:

– Ez li mirovan digerim. Meneya "kedîkirinê" çi ye?

Rovî got:

– Mirov xwedî tufeng in û derdikevin nêçîrê. Ev tiştekî gelekî ne xweş e! Ew mirîşkan jî xwedî dikin. Ew tenê guh li vê yekê dikin. Tu li mirîşkan digerî?

Mîrzayê biçûk got:

– Na. Ez ji xwe re li hevalan digerim. Meneya "kedîkirinê" çi ye?

Rovî got:

– Ew tiştekî gelekî kevin bûye û hatiye jibîrkirin. Meneya wê "çêkirina pêwendiyan e..."

– Çêkirina pêwendiyan?

Rovî vegerand:

– Helbet! Tu hêna ji bo min zarokekî biçûk wek sed hezar zarokên din î. Û ez ne bi hacetî te me. Û tu jî ne bi hacetî min î. Ez ji bo te roviyekî wek sed hezar roviyên din im. Lê eger tu min kedî bikî, her yek ji me ê bi hacetî yê din bibe. Tu ê wê gavê ji min re di cîhanê de bibî yekane. Ez ê jî ji te re bibim yekî yekane..."

Mîrzayê biçûk got:

– Ez nuh têdigihêjim. Guleke heye...ez bawer dikim ku wê min kedî kiriye...



– Ne dûr e, rovî got. Mirov li ser rûyê Erdê her celebên tiştan dibîne...

Mîrzayê biçûk got:

– Na! ew ne li ser Erdê ye.

Rovî hinekî matbû:

– Li ser gerestêreke din?

– Erê.

– Li ser wê gerestêrê nêçîrvan hene?

– Na.

– Va ye tiştekî xweş û balkêş! Û mirîşk?

– Na.

Rovî bi keser got:

– Mixabin tiştekî bê kêmasî tune.

Rovî ji dû hizrekê vegeriya û pirsî:

– Jiyana min î rojane wekhev e. Ez diçim nêçîra mirîşkan, mirov jî tên nêçîra min. Mirîşk hemû wekhev in û mirov jî hemû wekhev in. Ez wilo jî hinekî aciz dibim. Lê eger tu min kedî bikî, jiyana min ê giş rewşen û xweş bibe. Ez ê dengê payên te ji nav hemû dengên payan nas bikim. Dengê payên din ê min têxine binê erdê. Yê payên te ê wek dengê mûzîkê be, ew ê bang min bike û min ji qulê derxîne. Paşê biner! Tu li wê derê zadan dibînî? Ez bi xwe nan naxwim. Fêda genim nagihê min. Zeviyên tije gulên genim tiştekî ji min re nabêjin. Ma ev ne dijwar e! Lê porê te di rengê zêr de ye. Wilo jî, eger tu min kedî bikî, wê tiştekî pir xweş be! Gulên genimên zer ê te bînîn bîra min. Û wilo jî ez ê ji xişxişa bê di nava geniman de hez bikim...

Rovî rawestiya û bi dirêjayî li mîrzayê biçûk nêrî. Wî got:

– Ji bo Xwedê tu ê min kedî bikî!

Mîrzayê biçûk vegerand:

– Baş e! Lê pir wextê min tune. Gerek ez ji xwe re hevalan peyda bikim û hînî gelek tiştan bibim.

Rovî got:
– Mirov tenê dikare tiştên ku kedî dike bi rastî nas bike. Wextê mirovan ji bo naskirina tiştan yekcar nemaye. Ew ji bal dikandaran tiştên amade û çêkirî dikirin. Lê ji ber ku dikandarên ku hevalan difiroşin tunene, ew wilo jî bê heval in. Eger tu hevalekî dixwazî, min kedî bik!
– Ji bo vê yekê çi gerek e ez bikim?
Rovî vegerand:
– Gerek tu gelekî bêhnfireh bî. Tu ê pêşî hinekî dûrî min danişî, wilo, di nav giha de. Ez ê bi qorzîka çavên xwe li te binerim û tu ê dengê xwe nekî. Dengkirin çavkaniya şaştêgihaştinan e. Lê her roj tu ê bikaribî hinekî nêzîktir danişî...
Roja din mîrzayê biçûk dîsa hat.
Rovî got:
– Ya baştir ew e ku tu herdem di eynî saetê de bêyî. Eger, wek nimûne, tu saet çarên piştî nîvro bêyî, ez ê ji saet siyan de dest pê bikim xwe kêfxweş bibînim. Her ku saet nêzîktir bibe, ez ê wilo xwe bêtir xweşbext bibînim. Saet çar ez ê di nava xwe de bikelim û pirsan ji xwe bikim; ez ê wilo jî giranbuhayiya bexteweriyê nas bikim! Lê eger tu di çi wextê de bêyî, ez ê nizanibim kîjan saetê dilê xwe ji dîtinê re kok û amede bikim...Rêzik û ayîn ji me re divên.
Mîrzayê biçûk pirsî:
– Rêzik û ayîn çi ne?
Rovî vegerand:
– Ev jî tiştek e ku gelekî hatiye ji bîr kirin. Rêzik û ayîn ew in ew tişte ku dihêle ku rojek ji hemû rojên din cihê be, ku saet giş ne wekhev bin. Wek nimûne, rêzik û ayîn li bal nêçîrvanên min hene. Ew roja pêncşembê bi keçikên gund re dîlanê dikin. Wilo jî, pêncşemb rojek gelekî xweş e! Ez ji xwe re ta rezan digerim. Eger nêçîrvan kengî bûya dîlana xwe bikirana, roj ê giş wek hev bûna û rojên tatîlê ê ji min re tunebûna.

Wilo jî mîrzayê biçûk rovî kedî kir.
Û gava wexta çûyînê nêzîk bû, rovî got:
– Ax li min... Ez ê bigirîm.
Mîrzayê biçûk got:
– Sûc sûcê te ye. Min ji binî ve xirabî ji bo te nedixwest, lê te bi destê xwe mala xwe wêran kir û te xwest ku ez te kedî bikim...
Rovî got:
– Helbet min xwest.
Mîrzayê biçûk got:
– Ma ne tu ê bigirî.
Rovî vegerand:
– Helbet ez ê bigirîm.
– Ka te çi fêde kir?
Rovî got:
– Belê, bi saya rengê geniman min fêde kir.



Paşê wî berdomand:

– Here dîsa li gulan binere. Tu ê têbigihêjî ku gula te di cîhanê gişî de guleke yekane ye. Tu ê paşê beyî xatir ji min bixwazî û ez ê wê gavê wek xelatê tiştekî xwe ji te te re bêjim.

Mîrzayê biçûk rabû çû dîsa gulan bibîne. Wî ji wan re got:

– Hûn yekcar ne wek gula min in, hûn hêna ne tiştek in. Ne kesekî hûn kedî kirine û ne we kesek kedîkiriye. Roviyê min berê çawa bû hûn jî anuha wilo ne. Ew roviyekî wek sed hezarên roviyan bû. Lê min ew ji xwe re kir heval û anuha jî wek wî di bin stûna asmanan de rovî tunene.

Û gulan nizanîbûn çi bigotana.

Wî hêna ji wan re got:

– Rast e ku hûn xweşik in, lê hûn vala ne. Mirov nikare xwe ji bo xwe bide kuştin. Gula min ji bo rêwiyekî wek hemû rêwiyan helbet ê guleke wek we be. Lê ew bi tenha serê xwe ji we hemûyan çêtir e ji ber ku ew e ya ku min ew bi destên xwe av da. Ew birûmetir e ji ber ku ew e ya ku min ew xist bin camê. Ji ber ku ew e ya ku min bi surreperdeyê parast. Ji ber ku ew bû ya ku ji bo wê min kurmik kuştin (ji bilî du–sê kurmikên ku min hiştin ta ku bibin pinpinîk ). Ji ber ku ew e ya ku min li gazin û pesindan û ta li bêdengiya wê guhdarî kir. Ji ber ku ew gula min e.

Û ew vegeriya bal rovî...wî got:

– Xwedê negehdarê te be...

Rovî got:

– Xwedê negehdarê te be. Va ye sirra min, ew bi xwe gelekî sade ye: Mirov tenê bi dilê xwe dikare baş bibîne. Tiştên bingehîn bi çavan nayên dîtin.

Ta ku ew tişt di bîra wî de bimaya, mîrzayê biçûk ew dubare kir:

– Tiştên bingehîn bi çavan nayên dîtin.

– Wextê ku te di ber gula xwe de winda kiriye ew e ku dihê-

le ku hemû rûmeta wê gulê çêbibe.

Mîrzayê biçûk got ta ku di bîra wî de bimaya:

– Wextê ku min di ber gula xwe de winda kiriye...

Rovî got:

– Mirovan ev rastiya hanê ji bîr kirine. Lê gerek tu wê ji bîr nekî. Gava tu tiştekî kedî dikî, tu ji bo hergavê dimînî berpirsyarî wî tiştî. Tu berpirsayarê gula xwe yî...

– Ez berpirsyarê gula xwe me...mîrzayê biçûk dubare kir, ta ku ew yek di serê wî de bimaya.

## XXII

Mîrzayê biçûk got:

– Rojbaş.

şujinvanê reyên hesinî vegerand:

– Rojbaş.

Mîrzayê biçûk pirsî:

– Tu li vê derê çi dikî? Şûjivanê reyên hesinî vegerand:

– Ez rêwiyan ji nav hev vediqetînim, ez wan dikim qeflên hezar neferî. Ez trênên ku radihêjin wan geh bi aliyê rastê, geh bi aliyê çepê, bi rê dikim.

Û zûtrênek bi pencerên rohnî wek birûskê derbasbû û guregura awran hişt ku oda sazkirina tevgera tirênan bileriziya.

Mîrzayê biçûk got:

– Ew gelekî bilez in. Ew li çi digerin?

Şûjinvanê riyên hesinî vegerand:


– Şufêrê tirênê bi xwe jî nizane.

Û zûtrênek din bi camên rohnî ji aliyê din hat û kir guregur.

Mîrzayê biçûk pirsî:

– Ew çi zû vegeriyan...

Şûjinvanê rêyên hesinî got:
– Ew hinin din in. Ew dikevin şûna yên çûyî.
– Çima? ma ew ne kêfxweş bûn li dera ku lê bûn?
Şûjinvanê rêyên hesinî got:
– Mirov tucarî ne kêfxweş e li dera ku lê ye.
Û zûtrêneke sisiyan bi pencerên rohnî derbas bû.
Mîrzayê biçûk pirsî:
– Ew didin dû rêwiyên pêşîn?
Şûjinvanê reyên hesinî got:
– Na xêr, ew nadin dû tukesî. Ew di hundirê trênê de razayî ne an jî bawişkî dibin. Tenê zarok pozên xwe li ser camên penceran diperçiqînin.
Mîrzayê biçûk got:
– Tenê zarok dizanin li çi digerin. Ew wextê xwe bi bûkeke paçikî winda dikin û wilo jî ew bûk di çavên wan de bi rûmet dibe. Eger yek wê bûkê ji destên wan derxîne, ew digirîn...
Şûjinvanê rêyên hesinî got:
– Ew bextewer in.



## XXIII

Mîrzayê biçûk got:

– Rojbaş.

Yê dikandar vegerand:

– Rojbaş.

Wî hebine ku ji bo şikenandina tînê hatibûn çêkirin difirotin. Mirov dikarîbû di hefteyê de tenê hebek bixwara û nema zanîbû tîbûyîn çi ye.

Mîrzayê biçûk got:

– Çima tu vî tiştî difiroşî?

– Mirov dikare qeyametek wext fêde bike. Li gor hesab û lêkolînên pisporan, mirov dikare bi van heban di hefteyê de pêncî û sê deqan fêde bike.

– Ma mirov ê çi bike ji wan pêncî û sê deqan?

– Ew dikare hezar tiştî bike...

Mîrzayê biçûk ji xwe re got: " Eger pêncî û sê deqe li ber min vala hebin, ez ê wan bi çûyîna ber bi çavkaniyê derbas bikim..."

## XXIV

Heyşt rojên me li sehrayê di ser xerabûna motorê balafira min de derbas dibûn û min li çîroka yê mirovê hebfiroş guhdarî kiribû gava min dilopa dawîn ya ava xwe vexwar. Min ji mîrzayê biçûk re got:

– Belê, bîranînên te gelekî xweş in lê mixabin ne min motorê xwe dirûst kir û ne jî ava min ma. Ez ê jî kêfxweş bim eger ez wilo hêdîka berê xwe bidim çavkaniyekê! Wî ji min re got:

– Hevalê min î rovî...

– Kuro dev çîroka rovî–moviyan berde!

– Çima?

– Ji ber ku bê av em ê ji tîna bimirin...

Ew di gotinên min negihaşt û li min vegerand:

– Eger mirov li ber mirinek nêzîk be jî ew dîsa tiştekî xweş e ku hevalekî wî be. Ez bi xwe gelekî kêfxweş im ku roviyek hevalê min e...

Min ji xwe re got: "Malavayo bîr nabe çi xeter li ber wî heye. Ew tucarî ne tî ne birçî dibe. Tenê hinek rok besî wî ye...

Lê wî li min nêrî û wek ku hizra min di serê min de bixwenda got:

– Ez jî tî me... Heydê em li bîrekê bigerin...

Min ji bêzariyê nizanîbû çi bikira çi nekira: ew tiştekî gelekî dûrî aqilan e ku mirov di mezinbûna bê serî û bê binî ya sehrayê de wilo bi kwîranî li bîrekê bigere. Lê belê me dest bi meşê kir.

Gava em bi saetan bêdeng meşiyan, şev ket û stêran dest pêkirin rohnî kirin. Ji ber tîbûnê tayê hinekî ez girtibûm û ew stêrik li ber çavên min mîna di xwenek şevan de xuya dibûn. Gotinên mîrzayê biçûk di bîra min de dîlan dikirin:

Min jê pirsî:

– Na xwe tu jî tî yî?

Lê wî bersiva pirsa min neda. Wî tenê ji min re got:

– Av dibe ku ji bo dil jî baş û giring be...

Ez di bersiva wî de negihaştim lê min dengê xwe nekir... Min dizanîbû ku gerek min tu pirs jê nekirana.

Ew westiyayî bû. Ew rûnişt. Ez li kêleka wî rûniştim. Û piştî bêdengiyekê, wî dîsa got:

– Stêr ji ber guleke ku nayê dîtin wilo xweşik in...

Min vegerand "helbet" û bê ku min dengê xwe bikira min li ber tava heyvê li qermîçokên li ser rûyê xîzê nêrî. Wî berdomand:

– Sehra xweşik e.

Û ew yek rast bû. Min ji roja roj ji sehrayê hezdikir. Mirov lê li ser girikek xîzê rûdinê. Ew tiştekî nabîne. Ew dengê tiştekî nake. Lê belê ji wê bêdengiyê wek rohniyekê derdikeve û belav dibe... Mîrzayê Biçûk got:

– Tiştê ku dihêle sehra xweşik be, ew e ku li derekê ji derên wê bîreke veşartî heye...

Ez mat bûm ji ber ku ji nişkê ve ez di wê ronahiyê de gihaştim.

Di zaroktiya xwe de ez di xaniyekî kevin de bûm û dihat gotin ku gencîneyeke, xezîneke veşartî di wî de hebû. Helbet kesekî tucarî ew nedîtibû û belkî jî kesek tucarî jî negeriyabû. Lê belê hebûna wê efsanê rohniyek veşartî dida wî xaniyê hanê. Di kûraniya dilê xaniyê min de, surreke veşartî hebû... Min ji mîrzayê biçûk re got:

– Erê, rast e. Çi di xanî de, çi li ser stêrikan, an jî çi li sehrayê, tiştên ku wan wilo xweşik dikin bi çavan nayên dîtin! Wî got:

– Ez kêfxweş im ku tu û roviyê min hûn li hev dikin.

Ji ber ku mîrzayê biçûk di xew re diçû, min ew xist hembêza xwe û dîsa rêya xwe ajot. Wî dilê min gelekî tenik kiribû ji ber ku gava ew di hembêza min de bû, ji min re xuya bû wek ku min gencîneyeke pir nazik û zûşikest hilgirtibû. Ji min re xuya jî bû ku li ser rûyê Erdê, ji wê gencîneyê naziktir û zûşikestir tunebû. Min li ber tava heyvê li wê aniya spî, li wan çavên girtî, li biskên porê ku li ber bê dileriziyan dinêrî. Û min ji xwe re digot: "Tiştê ku ez anuha bi çavên xwe dibînim tenê qalik e, qaşir e. Tiştê bingehîn nayê dîtin..."

Ji ber ku li ser lêvên wî nîvgirtî nîvkenek hebû, min ji xwe re got: "Tiştê ku di vî mîrzayê biçûk de agir berdide nava min wefadariya wî ji bo gulekê ye, wêneya gulekê di nava wî de, ta di xewa wî de jî, mîna pêtên lempekê rohnî dide..." Min dizanîbû ku ew gelekî nazik û zûşikest bû lê min nizanîbû ku ew

bêpîvan wilo bû. Gerek mirov baş çiran biparêze: surrek ba dikare wan vemirîne...

Û ez wilo dimeşiyam gava di destê sibehê de ez rastî bîrekê hatim.

## XXV

Mîrzayê biçûk got:

– Mirov xwe dixin hundirê zûtrênan, lê nema dizanin ka li çi digerin. Wilo jî ew hema derin û tên û li dora xwe dizîvirin.

Û wî berdomand:

– Ne hewce ye...

Bîra ku em gihaştibûnê ne wek bîrên li sehrayê bû. Bîrên sehrayê tenê quleke di nava xîzê de kolayî ne. Ew bîra hanê wek bîrên gundan bû. Lê belê li wê derê tu gund tunebû û min bawer dikir ku ew xewnek bû. Min ji mîrzayê biçûk re got:

– Çi tiştekî seyr! Her tişt amede ye: çirik, dewl û werîs jî...

Ew keniya, wî destê xwe dirêjî werîs kir û bi çirikê lîst û ew bir û anî. Û çirik naliya. Ew bû wek banemeke kevin gava ba wexteke pir dirêj di xewê de dimîne. Mîrzayê biçûk got:

– Deng tê te? Em bîrê ji xew radikin û anuha ew distirê...

Min nedixwest ku wî xwe bêşanda û av bikişanda. Min jê re got:

– Bihêle! Ew ji bona te gelekî giran e.

Min dewla avê hêdîka ta ber devê bîrê hilkişand. Min ew xweşik danî ser kêleka bîrê. Di guhên min de stirana çirikê hêna dirêj dikir û min dît ku di ava ku hêna dileriziya rok jî dilerziya.

– Ez tiyê vê ava hanê me, mîrzayê biçûk got. Ka wê bide min ez vexwim...

Û min fêhm kir ew li çi geriyabû!

Min dewla avê bilind kir û nêzîkî lêvên wî kir. Wî çavên xwe girtin û vexwar. Ew ava hanê wek şadiya cejnekê bû. Ew ji adanekê, ji tiştekî wek xwarin û vexwarine bêtir bû. Ew ji meşa di bin stêran de, ji stirana çirikê, ji hêza destên min çêbûbû. Wê, wek xelatekê, dil hêşin û rewşen dikir. Gava ez zarokekî biçûk bûm, ronahiya dara Noelê, sirûdên limêja nîvêşevê, xweşîya kenan dihiştin ku xelata Noelê ya ku digihaşte min rewşen bibûya

Mîrzayê biçûk got:

– Mirovên ji bal te pênc hezar gulî di bexçekî de diçînîn... û di wî bexçî de, tiştê ku lê digerin nabînin...

Min vegerand:

– Ew nabînin...

– Û tiştê ku ew lê digerin dikare di gulekê tenê de, di hinek av de xuya bibe.

Min vegerand:

– Helbet!

Û mîrzayê biçûk berdomand:

– Lê çav kor in. Mirov gerek bi dilê xwe li tiştan bigerin.


Min vexwaribû. Bêhna min hatibû ber min. Xîz, di destê sibehê de di rengê hunguv de ye û ez bi wî rengê hunguv jî kêfxweş dibûm. Lê çima piştî wê kêfxweşiyê gerek ez xemgîn bibûma...

Mîrzayê biçûk hêdîka ji min re got:

– Gerek e ku tu soza xwe ji min re bi cih bikî. Ew dîsa li kêleka min rûniştibû.

– Soza çi?

– Tu xweş dizanî... devbendek ji bo berxê min... Ez berpirsyarê wê gulê me!



Min resmên xwe ên nîvco ji bêrîka xwe derxistin. Mîrzayê biçûk çav li wan ket û bi ken got:

– Darên te ên baobabê wek seriyên lehanan in...

– Na!

Min bi xwe gelekî serê xwe ji ber darên xwe bilind dikir!

– Roviyê te... guhên wî... hinekî wek qiloçan in... û ev guh pir dirêj in jî!

Û ew dîsa keniya.

– Kuro tu li min neheqiyan dikî. Tiştê ku ez hîn bûbûm tenê nigarên marên boa ên girtî û ên vekirî bûn.

Wî got:

– Lê ew ne xerab in. Zarok di wan de digihêjin.

Min bi qelema resas bi çend xêzan devbendek çêkir. Dilê min hat guvaştin gava min ew dirêjî destê wî kir.

– Tu ê tiştinan bikî ez nizanim çi ne...

Lê wî bersiva min neda. Wî ji min re got:

– Tu dizanî, di ser roja ketina min ya ser gerestêra Erdê...sibe wê salek derbas bibe...

Paşê, piştî bêdengiyekê, wî car din dengê xwe kir:

– Ez nêzîkî vê derê ketibûm...

Û ew sor bû.

Û dîsa, bê ku min bizanîbûya çima, xemgîneke bênav xwe li min girt. Lê belê pirseke ket serê min:

– Na xwe tu ne wilo tenha xwe bi kwîranî ji xwe re digeriyayî gava berî heyşt rojan me hevdu nas kir û ku tu bi hezar hezarên qonaxan ji avahiyan dûr bûyî? Na xwe tu vedigeriyayî ciyê ketina xwe?

Mîrzayê biçûk dîsa sorbû.

Û min bi dudilî berdomand:

– Gelo ji ber sersaliyê?..

Mîrzayê Biçûk car din sor bû. Wî bersiva pirsan tucarî nedida, lê, gava mirov sor dibe, ma meneya wê sorbûyînê ne "erê"

ye? Min got:

– Ax! Dilê min bitiris e...

Lê wî vegerand:

– Gerek anuha tu kar bikî. Gerek e tu vegerî cihê mekîna xwe. Ez ê li vê derê li bendî te bim. Sibe êvarê vegere...

Lê dilê min neketibû cîh. Rovî hate bîra min. Mirov dibe ku hinekî bigirî eger wî xwe hiştibe ku kedî bibe...

## XXVI

Li kêleka bîrê, kavilê dîwarekî keviri hebû. Gava ez êvara dotira rojê ji karê xwe hatim, ez ji dûranî çav li mîrzayê xwe yê biçûk ketim ew li ser dîwêr bû û wî nigên xwe berdabûn xwarê.

Û dengê wî gihaşte min wî digot:

– Na xwe nayê bîra te? Cî ne eynî cî ye!

Dengekî bêguman lê vegerand, ji ber ku wî paşê got:

– Belê! Belê! Roj ew roj e, lê cî ne eynî cî ye...

Min meşa xwe ber bi dîwêr ve berdomand. Min kesek nedît û dengê tukesî negihaşt guhê min. Lê belê mîrzayê biçûk ji nû ve got:

– ...Helbet. Tu ê li ser xîzê bibînî şopa nigên min li ku derê dest pê dike. Li wê derê li bendî min bimîne, ez ê îşev li eynî wê derê bim.


Tenê bîst gavek di navbera min û wî dîwarî de mabûn lê min herdem tiştek nedidît.

Mîrzayê biçûk hinekî bêdeng ma û dîsa got:

– Jehra te ji ya baş e? Tu serrast î ku ez ê demeke dirêj neyêşim?

Ez di cîh de rawestiyam û dilê min hat guvaştin, lê min herdem fêm nedikir. Wî got:

– Anuha here... Ez dixwazim dakevim!



Wê gavê min li ber nigê dîwêr nêrî û ez ji ciyê xwe pekiyam! Ez çi bibînim! Marekî zer ji wan marên ku di sî saniyan de dikarin gayekî bikujin li ber nigê dîwêr bû û serê xwe ber bi mîrzayê biçûk bilind kiribû. Ez li bêrîka xwe li demança xwe geriyam û bêdeng ez nêzîk bûm. Lê mar dengê min kir û wek ava ku ji erdê bipijiqe û ji nişkê ve bimire, wî marî hêdîka xwe berda xwarê. Wî bi rastî nelezand û xwe di nav keviran de di nav dengekî hesinî de winda kir.

Û di eynî wê wexta ku mîrzayê biçûk dihat xwarê ez gihaş-

tim ber dîwêr. Rûyê wî wek berfê spî bû û ew ket hembêza min.

– Ev ji te kêm e! Tu anuha bi maran re deng dikî!

Min milpêça ku jê qut nedibû vekir, hinek av li cênîkên wî kir û ew da vexwarin. Û anuha min nema diwêrîbû tu pirs jê bikirana. Wî bi giranî li min nerî û destên xwe li dora hustuyê min gerandin. Dilê wî mîna çûkekî ku bi xurdoqên tufengê bê xware û li ber mirinê be lêdida. Wî ji min re got:

– Ez kêfxweş im ku te dît çi di mekîna te de şikestî bû. Tu ê bikaribî vegerî malê...

– Tu çawa dizanî!

Min dixwest bi rastî ew agahiya hanê biguhesta wî û jê re bigota ku li gel ku ez tengezar bûm min balafira xwe çêkiribû!

Wî tu bersiv neda ber pirsa min û berdomand:

– Ez ê jî, îro, ez ê vegerim malê...

Paşê bi dilxemgînî:

– Lê ciyê ku ez ê herimê bi gelekî dûrtir e...Çûyîna wê derê gelekî dijwartir e...

Min dizanîbû ku tiştekî gelekî seyr li ber rûyê min li wê derê derbas dibû. Min ew wek zarokekî di hembêza xwe de guvaşt, lê belê, li gel ku min ew wilo xistibû hembêza xwe, ew ji min re xuya bû wek ku ew serberjêr di kunçaleke bêbinî de werdibû û ji nav destên min derdiket...

Nêrînên wî giran bûn û dûr çûbûn:

– Berxê te bi min re ye...Û sindoqa berx bi min re ye. Û devbend bi min re ye...

Û ew bi xemgînî keniya.

Min gelekî xwe ragirt. Ez pê dihesiyam ku hin bi hin ruh bi wî ve dihat.

– Lawikê delal, tu tirsyayî ne wilo...

Ew helbet tirsiyabû! Lê hêdîka keniya:

– Vê êvarê tirsa min ê bêtir be...

Ez carek din di ciyê xwe de sar bûm û min nizanibû çawa çareyek ji tiştekî ku çare jê re tunebû peyda bikira. Û ez têgihaştim ku min nikarîbû fikra ku ew kenê hanê rojekê ê ji ber guhên min biketa qebûl bikira. Ew ji bo min wek çavkaniya aveke zelal di dilê sehrayê de bû.

– Lawikê delal, ez dixwazim car din dengê kenê te bikim...

Lê wî ji min re got:

– Îşev, wê salek di ser hatina min re derbas bibe. Stêra min wê li jor di ser serê min re be, di eynî ciyê ku sala çûyî ez lê ketim...

– Lawikê delal, ew xewneke ne xweş e. Bêje ku ev çîroka mar û soza çûyînê û stêrê xewneke ne xweş e...

Lê wî bersiva pirsa min neda. Wî ji min re got:

– Tiştê bingehîn, nayê dîtin...

– Helbet.

– Wek ji bo gulê. Eger tu ji gulekê hez bikî û ku ew gul li ser stêrikekê be, bi şevan wê bi te xweş be ku tu li asmanan temaşa bikî. Hemû stêr guldar dibin.

– Helbet...

– Wek wê ava ku te da min û min vexwar. Ew av ji ber çirikê û wêrîs wek dengê mûzîkê bû...Tê bîra te...Ew xweş bû.

– Helbet.

– Bi şevê, tu ê ji xwe re li stêran binêrî. Cî û warê min gelekî biçûk e ta ku ez bikaribim stêra xwe nîşanî te bidim. Hîn çêtir! Stêra min wê ji bo te stêrek ji stêrên asmanan be. Wilo jî tu ê hez bikî ji xwe re li hemû stêran binerî...Ew ê giş hevalên te bin. Û paşê, ez ê xelatekê bidime te...

Û ew dîsa keniya.

– Ax!, lawikê delal, ez hez dikim li dengê kenê te guhdarî bikim.

– Ma ne min dixwest ew bi xwe ji te re bikira xelat...Ew ê ji bo te wek avê be...


– Ez tênagihêjim?

– Ji bo mirovan stêr giş ne wek hev in. Ji bo kesên ku koç dikin, stêrik rêber in. Ji bo hinin din, ew tenê rohniyine biçûk in. Ji bo zaniyaran ew serêş û teşqele ne. Ji bo karfermayê min ew zêr bûn. Lê eger hemû stêrik ji bo her kesî bêdeng in, ew ê ji bo te ne wek ji bo tukesî bin...

– Ez tênagihêjim!

– Gava tu ê bi şevan li asaman binêrî, ez ê li ser yekê ji wan bim û ji ber ku ez ê bikenim û wê ji bo te xuya bibe wek ku hemû stêr dikenin. Ji bo te, erê ji bo te, stêr wê bizanibin bikenin!

Û ew dîsa keniya.



– Û gava wê di ber dilê te de bê dan (mirov herdem dilanî dibe). Tu ê bi naskirina min kêfxweş bibî. Tu ê herdem hevalê min bî. Tu ê bixwazî bi min re bikenî. Û carinan tu ê ji bo kêfê pencera xwe vekî...Û hevalên te wê li te bimînin ecêbmayî çima tu li asmana dinêrî û ji ber xwe ve dikenî. Wê gavê tu

ê ji wan re bêjî: “Erê, stêrik herdem kenê min tînin!” Û ew ê bawer bikin ku tu dîn bûyî. Wilo jî, fena min wê li te bûbe...

Û ew dîsa keniya.

– Wilo jî min ê wek di şûna hemû stêrikan de qiyametek zengilên biçûk dabin te.

Û ew dîsa keniya. Paşê wî xwe car din giran kir û got:

– Îşev... ez naxwazim ku tu bêyî.

– Ez ê dev ji te bernedim.

– Tu ê bawer bikî ku ez ê bêşim...Yê li min binere wê bawer bike ku ez dimirim. Erê ew wilo ye... Neyê vê yekê nebîne, ne hewce ye...

– Ez ê dev ji te bernedim.

Lê ew xemxwar bû.

– Ez vê yekê...ji ber mar jî...ji te dixwazim. Nabe ku ew bi te vede...Mar pîs in. Ew dikarin ne ji bo tiştekî, tenê ji bo kêfê bi yekî vedin...

– Ez ê dev ji te bernedim.

Lê wek ku tiştekî dilê wî bixista cîh, wî got:

– Min ji bîr kiribû ku mar nikarin du caran li dû hev bi mirovan vedin...

Wê şeva hanê min nedît çawa wî da ser rê. Ew bi dizîka bê ku dengê xwe kiribûya çûbû. Gava paşê min xwe gihande wî, ew bi payine sivik û bi dilekî biryardar dimeşiya. Wî tenê ji min re got:

– Ha! Tu li vir î...

Û wî bi destê min girt. Lê car din tiştekî di nava wî de ew nerehet kir û wî got:

– Tu şaş bûyî tu hatî. Tu ê bêşî. Yê li min binerê wê bawer bike ku ez dimirim lê ew yek ê ne rast be...

Min bi xwe dengê xwe nedikir.

– Tu têdigihêjî! Devera ku ez ê biçimê gelekî dûr e. Ez nikarim vî gewdê hanê bi xwe re bibim. Ew gelekî giran e.

Min bi xwe dengê xwe nedikir.

– Lê ev gewdê hanê wê li şûna min wek qalikekî kevnî avêtî bimîne. Ma dilê mirovan ji ku bi qalikên kevin dişewite!...

Min bi xwe dengê xwe nedikir.

Dilê wî hinekî sar bû. Lê wî dîsa zor li xwe kir û got:

– Tu dizanî ku ew ê tiştekî xweş be. Ez ê jî ji xwe re li stêran binerim. Stêr hemû wê ji min re bibin bîrên bi çirikên zingargirtî, hemû stêr wê ava wexarinê bidine min...




Min bi xwe dengê xwe nedikir.

– Ew ê çi xweş be! Wê pênc sed milyon zengilên biçûk ên te hebin, wê pênc sed milyon çavkaniyên min hebin...

Û wî nema dengê xwe kir ji ber ku ew digiriya...
– Ev der e. Bihêle ku ez gavekî bi tena xwe bavêjim.
Û ew ji ber tirsa nava xwe rûnişt.
Wî dîsa got:
– Tu dizanî... gula min... Ez bi xwe berpirsyarê wê me! Tu nizanî ew çi qels e! Ew çi kawik e jî. Ew bawer dike ku ew herçar stiriyên pîsik ê ji her tiştî biparêzin...
Ez rûniştim ji ber ku min nema dikarîbû li ser darên nigan xwe bigirta. Wî got:
– Va ye... Anuha tev bû...
Ew dîsa hinekî dudilê bû, paşê ew rabû ser xwe. Wî tenê gavek avêt. Min nikarîbû xwe bilivanda.
Nêzîkî gûzeka wî wek birûskekê lêda. Ew kêlîkekê bêliv ma. Wî nekir qîrîn. Ew hêdîka wek darekê hat xwarê. Û ew hate xwarê lê ji ber xîzê tu deng ji ketina wî derneket.

## XXVII

Û anuha, helbet, şeş sal di ser wê yekê re derbas bûne... Min hêna tucarî ev çîroka hanê ji tukesî re negotiye. Hevkarên min gelekî kêfxweş bûn gava çav li min ketin û dîtin ku ez hêna sax bûm. Ez dilxemgîn bûm lê min ji wan re got: Ev ji ber westebûnê ye...
Anuha ez hinekî dildane bûme. Ez dixwazim bêjim... na bi rastî hêna kula dilê min dijwar e. Lê ez xweş dizanim ku ew vegeriyaye ser gerestêra xwe, ji ber ku roja din, di destê sibehê de, min laşê wî li wê derê peyda nekir. Ew ne laşekî wiqasî giran bû...Û bi şevan ez hez dikim li stêrikan guhdarî bikim.



Ew ji min re dibin wek pênc sed milyon zingilên biçûk...

Lê va ye tiştekî gelekî seyr û dûrî aqilan. Devbenda ku min ji bo mîrzayê biçûk çêkiribû, min ji bîr kiribû ez jê re benikên çermînî çêbikim ta ku ew bikaribe wê xweş bixe devê berx. Wilo jî ez ji xwe dipirsim: "Gelo çi li ser gerestêra wî qewimî ye? Kî dizane, belkî berx gul xwaribe..."

Carinan ez ji xwe re dibêjim: "Bêguman na! Mîrzayê biçûk her şev gula xwe dixe bin camê û baş hayê wî ji berx heye..." Wê gavê ez xweşbext dibim û hemû stêr bi nermî dikenin.

Carinan jî ez ji xwe re dibêjim: "Nabe ku mirov carekê ji caran xwe ji bîr neke û ew car bes e! Wî êvarekê cam ji bîr kiriye an jî berx bêdeng di şevê de derketiye..." Wê gavê jî, hemû zengilk dibin hêsir!...

Sirra mezin di vê de ye. Hûn ên ku wek min ji mîrzayê biçûk hez dikin, hûn dizanin ku cîhan, geytî tucarî wek xwe namîne eger li derekê ku em nas nakin, ku berxekî ku em nas

nakin, erê an na, gulek xwaribe...

Li asmanan binerin. Ji xwe bipirsin: Berx, erê an na gul xwariye? Û hûn ê bibînin ku, li gor bersivê, tişt bi giştî tên guhertin...

Û ne yek jî ji nav mirovên mezin ê bikaribe têbigihêje ku ev tiştekî çi giring e!




Ev dîmena hanê, ji bo min, dîmen di dunyayê gişî de hew jê xweştir hene. Ew bi xwe eynî dîmena pelê pêşiya xwe ye, lê min ew dîsa çêkir ta ku ez wî nîşanî we bidim. Li vê derê bi xwe, mîrzayê biçûk xuya bû û paşê, winda bû.

Bi balkêşî li vê dîmenê binerin ta ku hûn xweş wê nas bikin, eger rojekê hûn di wê derê, di wê sehra Afrîqayê re derbas bibin. Û eger rêya we bi wê derê ket, ez ê ji we tika bikim melezînin, tenê hinekî xwe li bin vê stêra hanê ragirin! Eger lawikek bi ber we ve bê, eger ew bikene, eger porê wî zêrînî be, eger ew bersiva pirsên jê tên kirin nede, hûn ê wê gavê nas bikin ew kî ye. Ji kerema xwe min wiqasî dilxemgîn nehêlin: ji min re zû binivîsin ku ew vegeriyaye...

# WEŞANÊN NÛDEMÊ

- BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ ◆ **Celadet Bedir-Xan** / Gramer
- DÊ Û DÊMARÎ ◆ **Egîdê Xudo** / Roman
- KESKESOR ◆ **Nûredîn Zaza** / Çîrok
- DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN ◆ **Rohat** / Lêkolîn
- HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ ◆ **Mehmed Uzun** / Essay (Ceribandin)
- MÎRZA MEHEME ◆ **Medenî Ferho** / Roman
- MILKÊ EVÎNÊ ◆ **Rojen Barnas** / Şiîr
- ZAROKA ŞEVÊ ◆ **Jack London** Werger: **Mustafa Aydogan** / Çîrok
- BIYANÎ ◆ **Albert Camus** Werger: **Fawaz Hesên** / Roman
- MÎRZAYÊ BIÇÛK ◆ **A. de Saint-Exupéri** Werger: **F. Husên** / Çîrok
- GOTIN ◆ **Yaşar Kaya** / Essay (Ceribandin)
- ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR Amadekar: **X. Duhokî**
- ŞEVÊN SPÎ ◆ **Dostoyevskî** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- MIŞK Û MIROV ◆ **John Steinbeck** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- BEXÇEYÊ VIŞNE ◆ **Çexov** Werger: **Firat Cewerî** / Piyes
- LI BENDA GODOT ◆ **Samuel Beckett** Werger: **Firat Cewerî** / Piyes
- GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: **Firat Cewerî** / Aforisma
- GIRTÎ ◆ **Firat Cewerî** / Çîrok
- KEVOKA SPÎ ◆ **Firat Cewerî** / Çîrok



Nivîskarê fransî **Antoine de Saint-Exupéry** ev pirtûka şêrîn **Mîrzayê Biçûk** ji bo biçûk û mezinan nivîsandiye. Ew dixwaze bi destên mezinan bigire û wan bigihîne zarokan, wan vegerîne xweşî û dilpakiya zaroktiyê. Hêviya nivîskar ew e ku ew mezinan, ango me, bispêre tixûbên jiyana rast û sade. Di vê pirtûkê de, her xwendevan, çi mezin çi biçûk dikare bi saya hevok û resiman li balafira xewnan siwar bibe û pêrgî Mîrzayekî biçûk were.

Ev pirtûka ku wergeriyaye piraniya zimanên cîhanê, hebûna wê ya bi kurdî xewneke xweş e.

Weşanxaneya me bawer e ku bi çapkirina vê pirtûkê berpirsiyariyeke dîrokî bi cih aniye û zimanê kurdî kiriye şirîkê zimanên cîhanî.